


LÎSTIK
SPIELE

RÎTÛEL
RITUALE

ÇIROK
GESCHICHTEN



BERHEVKAR / ZUSAMMENSTELLUNG

BARIŞ SEYİTVAN

2022



BERPİRSÊ PROJEYÊ / PROJEKTLÛTUNG

Bariş Seyitvan
2022

WERGER / ÜBERSETZUNG

Gözde Çakmak
Dilawer Zeraç
Julia Lauenstein

GRAFİK DÎZAYN / GRAFIKDESIGN

Uğur Acil

WÊNE / ILLUSTRATOR

Mesut Özkirtay

SPASÎ / DANK AN

Ali Kamber Aygün

Ali Rıza Kılınç

Amed Çeko Jiyân

Akram Hidou

Ali Koçak

Asmin Üzüm

Asya / Yıldız Çakar

Bariş Dikilitaş

Eğit Rûmet Arslanargun

Elmas Han

Fatih Bucak

Gohdar Selahaddin

Gudrun Wallenböck

Gözde Çakmak

Günay Darıcı

İrem Yılmaz

Minewer Aslan

Mustafa Ergün

Muhammed Kaya

Melahat Hekimoglu

Rezan Aksoy

Rêber / Rûbar Seyitvan

Sedat Uymaz

Sevgi İlbeç

Süleyman Üzüm

Şerif Derince

Şîrê Elîda Han

İrem Yılmaz

Uğur Acil

Ulaş Yunus Tosun

Xenia Görgl

Wirya Budaghi

Yaman Kaya

Yeko Ardil

Yıldız Çakar


Zera Soysüren


ALÎGİRÊ PROJEYÊ / PROJEKTRÄGER

Durchstarten

Förderprogramm für neue Expert*innen
der Kulturellen Bildung in Berlin

ŞÎRIKÊ PROJEYÊ / PROJEKTPARTNER



 Bundesministerium
Kunst, Kultur,
öffentlicher Dienst und Sport

**hinterland
galerie**

Girîng e ku her civat çand û nirxên xwe biparêze û wan derbasî nifşên siberojê bike. Lîstikên gelêrî yên zarokan, aliyên xwe yên hîsker, perwerdeker û veguhêzkarîya çandî heye. Herçî lîstik e, ji avabûna dinyayê bi vir de ye di nav mirov û ajalên de hebûna xwe dikudîne, di dema zarokbûna mirovan de li mirovan dibê alîkar da ku karibe xwe û dorhêla xwe nas bike. Li gorî Huzinga; Lîstik ji ferzkirinekê dest pê dibe û bi kêrî gihîştina wê armancê tê ku ne lîstik bi xwe ye. Dîrokzanê Holandî Johan Huizinga, di vekolîn xwe ya bi navê "homo Ludens (Mirovên Lîstikvan) de, peyitandîye ku lîstik berî çandê heye. Bi pêş de hatiye anîn ku hin lîstik henin ku bi ferasetên cuda tînen lîstin û teşe didin çandan.

Zarok, wekî fizîkî û psîkolojî ji mirovên mezin cuda ne. Ew di nav dinyaya xwe de dijîn. Nihêrîna wan a li bûyeran û nirxandina wan a bûyeran, xweserî wan e. Loma jî, hewcetîya sereke ya zarokan lîstik e. Digel vê hewcetiyê, li ku dera dinyayê zarok hebe, li wir lîstik jî heye. Zarok, ji mezinan cudatir, ew bi xwe dikarin hin hewcetiyên xwe yên fizîkî, hişûaqilî û civakî dabîn bikin û carinan jî ji bo pêkanîna wan hewcetîyan pêwîstîya wan bi piştevanîya mezinan çêdibe. Bi saya lîstikê, hewcetiyên xwe yên ku ew bi xwe dikarin dabîn bikin, pêk tînin. Lîstik ew çend girîng e ku piştî xwarin û vexwarinê wekî hewcetîya herî girîng tê qebûl kirin. Loma jî zarok li her civatê û di her şert û mercê de dilîze û dem bo vê yekê peyde dibe. Lîstik, bi giştî gava kêfa zarokan tîne, bi awayekî hişûaqilî jî wan perwerde dibe. Li jêr, kesên ku me hevditin bi wan re çêkir û tiştên wan ji me re got û di wan mînakên de ku li gundên Kurdistanê tînen lîstin û me mînak li ser wan lîstikan dane; piranîya wan lîstikan bi liv û tevger in, parvekirinê didin pêş, hîni çareserkirinê dikin û fikirîna li serê wekî divêtî didin pêş û ev alî û dawera lîstikan pir girîng e.

Für jede Gesellschaft ist es wichtig ihre Kultur und Werte zu bewahren und an kommende Generationen weiterzugeben. So tragen auch traditionelle Kinderspiele kulturelle, pädagogische und lehrreiche Aspekte in sich. Durch das Spiel, das schon seit Anbeginn der Zeiten zwischen Mensch und Tier besteht, lernt der Mensch während seiner Kindheit sich selbst und seine Umwelt kennen. Der niederländische Kulturhistoriker Johan Huizinga bringt die These vor, dass es im Spiel um ein Ziel geht, das außerhalb des Spiels liegt. In seiner Studie Homo Ludens („Der spielende Mensch“) hat er bewiesen, dass das Spiel vor der Kultur existierte. Zudem seien es Spiele, die die Kultur formen und verschiedene Identitäten schaffen.

Kinder unterscheiden sich sowohl physisch als auch psychisch von Erwachsenen. Sie leben in ihrer eigenen Welt. Ihre Perspektive und Einschätzung von Geschehnissen hebt sich ab. Deswegen ist das grundlegendste Bedürfnis von Kindern das Spiel. So gibt es überall auf der Welt Spiele, wo es auch Kinder gibt. Kinder können einen Teil ihrer geistigen, körperlichen und sozialen Bedürfnisse selbstständig befriedigen, jedoch brauchen sie im Gegensatz zu Erwachsenen manchmal Unterstützung dabei. Das Spiel ist eine Möglichkeit, mit der sie diese Bedürfnisse selbstständig erfüllen können. Spielen gilt sogar als so wichtig, dass es neben der Ernährung als das wichtigste Bedürfnis angesehen wird. Daher spielt das Kind überall und zu jeder Zeit unter jedweder Bedingung. Spielen ist nicht nur unterhaltsam, sondern sowohl lehrreich als auch entspannend für den Geist. In den weiter unten beschriebenen Spielen, die uns verschiedene Menschen erklärt haben und die vor allem in den Dörfern Kurdistans gespielt werden,

Lîstik hêmana sereke ye ji bo ku zarok ji alî fizîkî, derûnî, civakî û çandî ve bi awayekî tendurist û xweş rabin. Lîstik di heman demê de, tevkarî li pêvajoya hînkirin û perwerdekirinê dikin û piştevanî lê dikin. Loma jî, divê mirovên mezin, di her şert û mercê de, ji bo ku zarok bi lîstina lîstikan mezin bibin, pêjnkar û baldar bin. Di hevdfîtinên ku min bi malbatên Kurd re çêkirin, ku her yek ji herêmeke cuda ya Kurdistanê hatibû Berlinê, her malbatê behsa wan lîstikan kirin ku an wan bi lîstine an jî dê û bavê xwe hîn bûne an jî tenê navê lîstikê bihîstine.

Lîstikên ku zarokên Kurd di şevên dirêj yê zivistanê de dilîzin, lîstikên ku zarok ji bo sosyalîzebûnê û dembihurandina bi awayekî xweş bi hevalên xwe re dilîzin, her ku diçe tê jîbîrkirin. Baldarîya li ser van lîstikan pir kêmbû û êdî wisa bû ku ev lîstik qet nehatin lîstin. Bi salan e zarokên malbatên ku ji ber sedemên politîk û yê din ji Kurdistanê koçî Ewropayê kirine, êdî hew ev lîstik lîstin û her ku çû ev lîstik hatin jîbîrkirin. Helbet ev rewş bi teknolojiyê re jî eleqedar e. Di nav endamên malbatê de gelemşeyên pêwendîyê dan der. Her kesî telefon, tablet an jî amrazekê dijîtal da destê xwe û ew wekî lîlikek (pêlîstokek) qebûl kir û pê ve dabestîya.

Di vê qonaxa vekolîna xwe de min xwest hûngerîyê li ser lîstikan bikim û lîstikên ku hatine jîbîrkirin an jî êdî hêdî hêdî tê jîbîrkirin, car din ji malbatan guhdarî bikim. Hin ji wan lîstikan her wekî awayê xwe yê li jêr hatine gotin.

Bariş Seyitvan

wird besonders Bewegung gefördert, zum Teilen, sowie zum Denken und Finden von Lösungen angeregt.

Kinderspiele sind der wichtigste Faktor in der körperlichen, geistigen, sozialen und kulturellen Bildung eines gesunden Menschen. Spiele sind zugleich ein wichtiger Bestandteil in der Schulbildung von Kindern. Aus diesem Grund ist es wichtig, dass Erwachsene darauf achten, dass Kinder die Möglichkeit haben zu spielen. Im Rahmen einer Untersuchung habe ich mit kurdischen Familien in Berlin, die aus verschiedenen Städten und Regionen Kurdistans stammen, über Spiele gesprochen, die sie selbst gespielt haben oder die sie von ihren Eltern kennen. Viele Spiele geraten allmählich in Vergessenheit. Spiele, die in langen Winternächten gespielt werden. Spiele, die Kinder mit Gleichaltrigen spielen, um sich zu amüsieren und zusammen zu sein. Das Interesse an diesen Spielen nimmt immer weiter ab, sodass sie kurz davor sind, vergessen zu werden. Viele Kinder der Familien, die unter anderem aus politischen Gründen aus Kurdistan nach Europa ausgewandert sind, spielten diese Spiele noch hier, aber zunehmend geraten sie in Vergessenheit. Ein wichtiger Grund dafür sind natürlich die modernen Technologien. In den Familien kommt es zu ernsthaften Problemen in der Kommunikation, denn alle beschäftigen sich zunehmend mit Smartphone, Tablet oder anderen digitalen Medien.

Aus diesem Grund habe ich mich auf die Suche nach diesen verlorenen Spielen gemacht und verschiedene Familien dazu befragt. Einige dieser Spiele gehen wie folgt:

Bariş Seyitvan

Nivîsandîna pêşgotina vê berhemê ji bo min tiştêki gelekî bi taybet e, ji ber ku çîrok, çîrçîrok û lîstikên di berhemê de hatine vegotin, zarokatiya min, cihên ez lê ji dayik bûme û mezin bûme tîne bîra min. Bêguman ev ne bi tenê ji bo min û ji bo Komela Yekitiya Malbatên ji Kurdistanê li Almanyayê (YEKMAL) ku ez rêveberiya wê dikim, di heman demê de ji bona wêjeya kurdî ya pîrzimanî jî xebateke gelekî watedar û hêja ye. Ev komel bi salan ne, ji bo sûdmendiya malbatên bi eslê xwe kurd in û zarokên wan kampanyayan li dar dixê. Armanç bi çalakîyên duzimanî, kurdî/almanî hişmendî û têgihîştina ziman û çanda kurdî hêskirin e. Bi van çalakî û pêşkêşiyên ji bo malbata û zarokan li du baxçeyên zarokan bi duzimanî, lênêrîn, piştgirî û perwerdeya pêwîst ya pedagojîk tê dayin.

Wek ez dizanin ku lîstik, çîrçîrok û çîrok ne bi tenê ji bo piştgiriya pêşxistina ziman, di heman demê de ji bo têgihîştina beşên çandî, adet û kevneşopîyan jî di nava xwe de dihewîne. Divê xebat û pêşkêşiyên bi vî rengî bîna teşwîqkirin û berdewamkirin. Em weke sazî, bi avêtina geveke mezin di vî warî de gelekî kêfxweş in. Ev xebat, di 2021ê de di çarçoweya Hefteyê Çanda Kurdî de bi hevkarîya hunermendê kurd Barîş Seyitvan hat pêkanîn. Ez dixwazim, bi vê pêwendiyê ji hemû kesên di Hefteyên Çanda Kurdî piştgiriya me kirine re spasdariyên me pêşkêş bikim. Dîsa gelekî spas ji bo piştgiriya Weqfa Durchstartenê ya aborî. Û spasiyeke taybet ji bo amadekirin û birêvebirina vê xebatê bi fedekarî û azweriyeke mezin, ji Barîş Seyitvan re.

**Günay Darici, Pedagoğa pîspor
Rêvebera Komela Yekmalê**

Ein Vorwort zu dieser Arbeit schreiben zu dürfen ist für mich etwas ganz Besonderes, denn die hier beschriebenen Geschichten und Spiele erinnern mich an meine Kindheit, an jene Orte, an denen ich geboren und aufgewachsen bin. Nicht nur für mich, sondern auch für den Verein Yekmal e.V., in dem ich geschäftsführend tätig bin, ist die Publikation von mehrsprachiger Literatur in kurdischer Sprache nicht selbstverständlich.

Der Verein selbst setzt sich seit vielen Jahren für die Interessen von Familien und Kindern mit kurdischen Wurzeln ein. Durch die zweisprachigen Angebote in kurdisch/deutsch soll der Zugang zur kurdischen Sprache und Kultur erleichtert werden. Neben zahlreichen Eltern-Kind-Angeboten, Aktivitäten und in zwei bilingualen Kitas bekommen die Kinder die notwendige pädagogische Betreuung. Es ist uns bewusst, dass durch Spiele, Märchen und Geschichten nicht nur der Spracherwerb gefördert sondern auch Teile der Kultur, Bräuche und Traditionen vermittelt werden. Dies gilt es weiterhin zu fördern und wir sind froh, dass mit dieser Arbeit ein großer Schritt in diese Richtung getan wurde. Diese Arbeit wurde in Kooperation mit dem kurdischen Künstler Baris Seyitvan im Rahmen der Kurdischen Kulturwoche 2021 durchgeführt. Ich möchte mich an dieser Stelle bei allen Menschen bedanken, die uns bei den Kurdischen Kulturwochen unterstützt haben. Ein Dank gilt auch der Stiftung Durchstarten, die uns finanziell gefördert hat. Einen besonderen Dank möchte ich selbstverständlich Baris Seyitvan aussprechen, der die Arbeit mit großem Engagement und Leidenschaft vorbereitet und durchgeführt hat.

**Günay Darici, Dipl. Sozialpädagogin
Geschäftsführerin Yekmal e.V.**

Lîstik, rîtûel û çîrok derfeteke baş dide me ku em çand û kevneşopiyên dîtir nas bikin. Bariş Seyitvan di lêgerîna lîstok û rîtûelên kevneşopî yên Kurdî de ku koçberên Kurd ên li Berlînê hê jî li derve ne, bi bîr tîne û dike mijar. Lêkolînek li ser kevneşopî û parastina wê, di hawîrdorek nû de, di çandek nû de...

Em kêfxweş in ku niha derfeta me heye em vê berhevoka lîstok, rîtuel û çîrokên têkildar li Hinterlandê pêşkêş bikin. Weşana duzimanî ya ku derketiye holê – bi Kurdî/Kurmancî û Elmanî – ne tenê ji bo belgekirin û tomarkirina vê lêkolînê ye, her wisa di heman demê de ji bo piştgirîya belavkirina vê naveroka giranbiha ye: Ji bo Kurd kevneşopiyên xwe biparêzin, ji bo ku yên ne-Kurd in jî li ser kevneşopiyek biyanî bibin xwedî derfetê têgihiştina çandî.

Spas ji bo nîqaş û pêşkêşîya vê lêkolîna hêja ya Bariş Seyitvan.


**Gudrun Wallenböck,
Derhênerê Hunerî yê Hinterlandê**

Spiele, Rituale und Geschichten eröffnen uns eine gute Möglichkeit andere Kulturen und Traditionen kennenzulernen. Baris Seyitvan hat sich auf die Suche nach überlieferten kurdischen Spielen und Ritualen begeben, an die sich kurdische Migrant/innen in Berlin immer noch erinnern, bzw. auch im Ausland weiterführen. Eine Recherche zu Tradition und Aufrechterhaltung eben dieser in einer neuen Umgebung, in einer neuen Kultur.

Wir freuen uns, dass wir nun die Möglichkeit haben diese Sammlung an Spielen, Ritualen und dazugehörigen Geschichten auch im hinterland präsentieren zu können. Die dazu entstandene zweisprachige Publikation – in kirmancî und deutsch – soll nicht nur diese Recherche dokumentieren, sondern auch die Verbreitung dieser wertvollen Inhalte unterstützen: Für Kurd/innen um ihre eigenen Traditionen aufrechtzuerhalten, für Nicht-Kurd/innen die dadurch einen Einblick in eine fremde Kultur bekommen.


Danke Baris Seyitvan für diese wertvolle Auseinandersetzung und Präsentation Deiner kurdischen Recherchen.

**Gudrun Wallenböck,
künstlerische Leitung Hinterland**



LÎSTIK Û RÎTÔEL

SPIELE UND RITUALE





Navê Lîstikê / Name des Spiels

HEFTOK *HEFTOK*

Cîyê ku Lîstik lê Tê Lîstin: Li gelek bajarên Kurdistanê tê lîstin.

Kê vegot: Melahat Hekimoğlu

Jê re kê vegotiye: Dayikawî

Bi çend kesan tê lîstin: Herî kê m bi du kesan tê lîstin.

Kelûmel: Pênc kevirên ku di mistekê de hiltên. Ev kevir bi giştî di şiklê hêkane de ne.

Temenê ku lîstik tê lîstin: 6+

Wo das Spiel gespielt wird: In vielen Provinzen Kurdistans


Erklärt von: Melahat Hekimoğlu

Gelernt durch: Ihre Mutter

Anzahl der Spieler*innen: Mindestens 2 Personen

Benötigte Gegenstände: fünf (ovale) Steine, die in die Handfläche passen

Altersempfehlung für das Spiel: 6+



Em ji malbatan hîn dibin ku bi taybetî berîya salên 2000î ev lîstik pir hatiye tercîhkirin. Bi giştî zarokên keçînan vê lîstikê dilîzin. Lê belê carinan em dibînin zarokên kurînan jî dilîzin. Em hîn dibin ku zarokên keçînan, bi taybetî wê gava ku ji xebata erd û zevî û bax û baxçê vedigerin mala xwe, hem ji bo ku bigihîjin hev hem jî ji bo ku dema xwe xweş bibihurînin, vê lîstikê tercîh dikin. Bi kurtasî, vê lîstikê di warê sosyalîzebûna zarokên keçînan de cîyekî xwe yê girîng heye. Yek ji lîstika herî populer û li ber çavan e ku li deverên gundewar û bi kevîran tê lîstin. Lîstikeke wisa ye ku pêşketina motora stûr-motora zirav destek dike, senkronîzasyona dest û çav û tevliwîne xurttir dike, refleksên zarokan bileztir dike û geş bi baldarîyê dide. Di heman demê de zarok bi vê lîstikê dikare bi hestên xwe yê binketin û serketinê re jî serederîyê bike û li benda dora xwe bimîne.

Çawa Tê Lîstin:

Pênc kevîrên ku di mistekê de hiltên, tê peydekirin. Serê pêşî ev di mistekê tê xistin û paşê li erdê tê belavkirin. Ji erdê kevîrek tê hildan. Gava ew kevîr hat hildan divê kevîrên din jî şûna xwe neleqin. Piştî ku kevîrek hat hildan, di lîstika pêşî de ku navê wê yekan e, lîstikvan kevîrê di destê xwe de diavêje hewayê û di heman demê de jî ji erdê kevîrekî hildide û divê kevîrê ku avêtiye hewayê jî bikeve nav mîsta lîstikvan. Lîstik bi dorê wekî duyan, sêyan û çaran didome. Di ya pêncan de tiliya nişanekê datîne ser tiliya beranê û li erdê dirûvê pirê çêdike. Kevîrê hildayî diavêje hewayê, bêyî ku mudaxele li kevîrên erdê bike, divê di sê çaran de di bin pirê re derbas bike. Di qonaxa dawî de jî, hemû kevîran diavêje hewayê û bi piştê destê xwe wan li hewayê diqefêle û car din wan diavêje hewayê û vê carê bi mîsta xwe diqefêle. Di mîsta lîstikvan de çend kevîr hebin ew qas puan bi dest dixê.

Heftok soll vor allem in den 2000er Jahren ein sehr beliebtes Spiel gewesen sein. Normalerweise wird es unter Mädchen gespielt, aber auch Jungen spielen dieses Spiel gern. Es wird erzählt, dass vor allem Mädchen, die im Garten oder auf dem Feld arbeiten, es gerne spielen, wenn sie nach der Arbeit nach Hause kommen, um sich mit ihren Freundinnen zu treffen und sich zu amüsieren. Das heißt, dieses Spiel ist in der Sozialisation von Mädchen von großer Bedeutung und vor allem in ländlichen Regionen sehr beliebt. Im Spiel wird die Grob- und Feinmotorik der Kinder gefördert und auch die Koordination von Hand und Auge, sowie die Konzentrationsfähigkeit. Durch dieses Spiel lernen die Kinder mit Sieg und Niederlage umzugehen, mit dem Gegner auszukommen und zu warten, bis man an der Reihe ist.

Spielanleitung:

Man sammelt zunächst 5 Steine, die in die Handfläche passen. Diese werden auf den Boden gelegt und dann wird ein Stein in die Hand genommen, ohne dass sich die anderen Steine bewegen. Dieser Stein wird nun in die Luft geworfen und wieder aufgefangen, während mit der anderen Hand ein weiterer Stein vom Boden aufgenommen wird. Dieser Vorgang wird mit zwei, drei und vier Steinen wiederholt. Beim fünften Stein formt man aus Daumen und Zeigefinger eine Brücke am Boden. Die Steine werden auf den Boden gelegt und dann wird ein Stein in die Hand genommen, in die Luft geworfen, so dass er drei Mal unter der Brücke hindurch springt, ohne dass die anderen Steine ihn berühren. In der letzten Phase werden alle Steine in die Luft geworfen, dann mit dem Handrücken erneut nach oben gestoßen und dann mit der Handfläche aufgefangen. Die Spielpunkte ergeben sich aus der Anzahl der Steine, die aufgefangen wurden.

Navê Lîstîkê / Name des Spiels

DAR Û QÎTIK

DAR Û QÎTIK

Cîyê ku Lîstîk lê Tê Lîstin: Li Gellek Bajarên Kurdîstanê

Kê vegot: Süleyman Üzüm

Jê re kê vegotiye: Bavêwî

Bi çend kesan tê lîstin: Bi giştî bi du koman û bi sê an jî zêdetir kesan tê lîstin.

Kelûmel: Du darîkên bi qasî 15 santîmetreyan dirêj ku serê wan hatiye tûjkirin û şivdareke bi qasî 70 santîmetreyan dirêj. Wekî din jî du kevirên mezin pêwîst e.

Temenê ku lîstîk tê lîstin: 12+

Wo das Spiel gespielt wird: In vielen Provinzen Kurdistans

Erklärt von: Süleyman Üzüm

Gelernt durch: Seinen Vater

Anzahl der Spieler*innen: 3 oder mehr Personen, normalerweise in zwei Teams

Benötigte Gegenstände: Zwei ca. 15 cm lange Holzstücke, die an beiden Enden angespitzt sind; ein ca. 70 cm langer Stock; zwei Steine

Altersempfehlung für das Spiel: 12+

Di qadên servekirî de tê lîstin. Carinan mezin jî tev li lîstîkê dibin.

Dar û Qîtik ist ein Spiel, das draußen gespielt wird. Manchmal spielen auch Erwachsene dieses Spiel.



Çawa Tê Lîstin:

Kesên ku wê lîstikê bilîzin dibin du kom. Ji her komê kesek tê bijartin û ev kesên hatine bijartin qîtikan diavêjin bi dûr ve. Kê ku qîtik avêt cîyê herî dûr dest bi lîstikê dike. Berî ku lîstik dest pê bike, du kevir li erdê tê danîn û koma hevrik diçe li pêşberî her du keviran disekine ku wê qîtik bi wî alî ve were avêtin. Wekî din jî xêzek tê kişandin di wî cîyê de ku koma hevrik lê ye. Lîstikvanên koma hevrik li paş vê xêzê ji hev belav dibin. Lîstikvan, darikê kin datîne ser her du kevirên li teniştê hev û şivdarê dirêj datîne binê darikê, bi lêdanê darik bi hewayê dixê û heta jê tê bi hişkî li darikê dixê û dişîne bi alî ku lîstikvanên hevrik lê ne. (Ger nikaribe li hewayê li darikê xe, dora wî dişewite û dor diçe ser koma hevrik) Heke koma hevrik karibe darik li hewayê biqefêle, dora lîstikê diçe ser wan û puan bi dest dixin. (Ji ber ku serê darikê (qîtikê) tûj e gelek zehmet e ku li hewayê bê qefaltin.)

Heke nikaribin darik (qîtik) li hewayê bigirin, bi alîkariya şivdarê, hewl didin ku li her du aliyên tûjikê darikê biçûk yê li erdê bixin û di sê caran de wî nêzî cîyê ku her du kevir lê ne bikin. Û tê dixebitin ku şivdarê dirêj daynin ser her du keviran û wî ji wir bixînin. Divê şivdar bi qîtikê ji ser kevir bê xistin, ger neyê xistin dor diçe ser koma hevrik.

Spielanleitung:

Es werden zwei Mannschaften gebildet. Jede Mannschaft wählt eine Person aus, die die beiden Holzstücke (Qîtik), so weit sie kann, wirft. Die Person, die am weitesten wirft, beginnt das Spiel. Dazu werden zwei Steine auf den Boden gelegt, über die die Holzstücke gelegt werden. Außerdem wird eine Linie gezogen, hinter der sich die gegnerische Mannschaft befindet. Dann legt der Spieler den Stock unter das Holzstückchen, das auf den beiden Steinen liegt, wirft es nach oben und schlägt es mit aller Kraft nach vorn. (Falls der Spieler das nicht schafft, ist die gegnerische Mannschaft an der Reihe.) Nun muss die gegnerische Mannschaft versuchen das Holzstückchen zu fangen, was sich als schwierig erweisen kann, da beide Enden angespitzt sind. Falls sie es schaffen, bekommen sie einen Punkt und sind nun selbst an der Reihe. Wenn sie es nicht schaffen, müssen sie das Holzstückchen mit dem Stock mit drei Schlägen wieder zu den Steinen befördern. Dann legt man den langen Stock auf die beiden Steinen, damit er abgeschossen werden kann. Falls die Mannschaft, die an der Reihe ist, den Stock mit Hilfe der Holzstücken zum Fallen bringt, geht die Runde an sie. Wenn sie es nicht schafft, ist die gegnerische Mannschaft an der Reihe.



Navê Lîstîkê / Name des Spiels

MALEK HEYE

DORT IST EIN HAUS

Cîyê ku Lîstîk lê Tê Lîstin: Li Gellek Bajarên
Kurdîstanê

Kê vegot: Gohdar Salahaddin

Kê jê re vegot: Dayîkawî

Bi çend kesan tê lîstin: Bi malbatî

Kelûmel: Kelûmel nahê bi karanîn

Temenê ku lîstîk tê lîstin: 5+

Wo das Spiel gespielt wird: In vielen Provinzen
Kurdistans


Erklärt von: Gohdar Salahaddin

Gelernt durch: Seine Mutter

Anzahl der Spieler*innen: Die ganze Familie

Benötigte Gegenstände: Keine

Altersempfehlung für das Spiel: 5+



Ev lîstik di nav endamên malbatê de pir zêde tê lîstin. Ji ber ku kelûmelek zêde hewce nake û wekî tercîh li malê tê lîstin. Tê gotin berî salên 1990î pir zêde hatiye lîstin. Bi taybetî di şevên sar yên zivistanê û di wan salan de ku elektrîk tunebûye, ew çalakî ye ku ji bo derbaskirina demê pir hatiye kirin. Bi rêya vê lîstikê hem şênîyên gund hev nas dikin hem jî der heqê wan de agahî tê hildan. Wek din jî ji bo ku mêjiyê zarokên biçûk her tim li kar be, tê kirin.

Dieses Spiel wird vor allem innerhalb der Familie gespielt. Da man nichts weiter dafür benötigt, wird es sehr gern gespielt. Es wurde viel in den 1990er Jahren und in der Zeit davor gespielt. Besonders in kalten Winternächten und Zeiten, in denen es noch keine Elektrizität in den Dörfern gab, war es sehr beliebt. Durch das Spiel erfährt man viel über die anderen Menschen im Dorf und außerdem ist es für kleine Kinder ein sehr gutes Gehirntraining.



Çawa Tê Lîstin:

Zarokên ku di menzelê de ne an jî endamên malbatê li hev kom dibin û yek ji wan dest bi pirsîna pirsêkê dike. Behsa endamên maleke ji gund tê kirin lê belê navê wan nayê hildan. Wekî mînak, tê gotin, malek heye, di nava vê malê de kalemêrek û pîrejînek heye, kurê mêrik, pîreka wî, sê keç û sê kurên wî hene. Bi awayê, de ka tê derxin ev mala kê ye, tê pirsîn. Her kes bi dorê bersivê dide. Kê ku bersiv tê derxist, dora pirsîrînê diçe ser wî. Heke kes nikaribe bersivê tê derxîne, kesê ku pirs kiribû, car din pirsêke din jî dike.

Spielanleitung:

Die Kinder oder Familienmitglieder im Raum versammeln sich und jemand beginnt Fragen zu stellen. Dabei wird etwas über ein Haus im Dorf erzählt, aber keine Namen genannt. Zum Beispiel so: „Es gibt ein Haus, in dem ein alter Mann und eine alte Frau leben. Sie haben drei Töchter und zwei Söhne. Ratet mal, wessen Haus das ist!“ Jeder antwortet reihum. Die Person, die die Antwort errät, stellt die nächste Frage. Wenn niemand die richtige Antwort errät, stellt die gleiche Person erneut eine Frage.

Navê Lîstîkê / Name des Spiels

HEFTBER

SIEBEN STEINE (ODER SIEBEN TÜRME)

Cîyê ku Lîstîk lê Tê Lîstin: Li Gellek Bajarên Kurdistanê
Kê vegot: Zera Soysüren
Kê jê re vegot: Dayîkawî
Bi çend kesan tê lîstin: Herî kê m bi 7-8 kesan tê lîstin.
Kelûmel: Heft berên (kevirên) pehn û gogek
Temenê ku lîstîk tê lîstin: 5+

Wo das Spiel gespielt wird: In vielen Provinzen Kurdistans
Erklärt von: Zera Soysüren
Gelernt durch: Seine Mutter
Anzahl der Spieler*innen: mindestens 7-8 Personen
Benötigte Gegenstände: Sieben Steine; ein Ball
Altersempfehlung für das Spiel: 5+



Heftber listikeke komî ye. Heft ber li ser hev tèn danîn û ji dûringîyekê gok tê avêtin da ku kevir bên wergerandin. Bi taybetî zarokên dibistana seretayî bi komikên zêde vê listikê dilîzin.

Çawa Tê Listin:

Pêşî listikvan hevalên xwe yên listikê hildibijêrin. Hilbijartina hevalên komê, bi awayekî beranberî ye û du kes bi dorê hildibijêrin. Ev yek pêşî lê digire ku kesên pir xurt û pir lawaz di heman komê de bin. Piştî hilbijartina hevalan bi dawî dibe, biryar tê dayîn ka kî wê dest bi listikê bike.

Piştî heft ber li ser hev tê nijinandin û kêm zêde 15 cm dûrî keviran xêzek tê çixêzkin. Yek ji listikvanê koma yekem gogê hildide û ji bo ku berên (kevirên) li ser hev nijinandî birûxîne, gogê diavêje. Piştî ku gog li keviran dikeve û kevir dikevin erdê, listikvanên din ên koma ku berên nijinandî rûxandiye, bi vir de û wir de direvin. Listikvanên koma hevrik ku hema li ber keviran sekinandî ne, hewl didin ku gogê li listikvanê koma hevrik bixin û wan ji listikê bişewitînin. Di vê navê de, listikvanên koma hevrik yên ku pev direvin, hewl didin ku bên û kevirên ketî erdê car daynin ser hev.

Es handelt sich dabei um ein Mannschaftsspiel. Sieben Steine werden übereinander gelegt und dann wird versucht aus einer vorgegebenen Distanz die Steine mit einem Ball umzuwerfen. Dieses Spiel wird vor allem in großen Gruppen gespielt, insbesondere von Grundschulkindern.

Spielanleitung:

Zuerst werden zwei Mannschaften gebildet. Das passiert durch die abwechselnde Wahl von zwei Personen. Dadurch wird gleichzeitig verhindert, dass in einem Team nur starke oder schwache Spieler*innen sind. Daraufhin wird entschieden, welche Mannschaft beginnt.

Es werden sieben Steine übereinander gelegt und in einer Entfernung von ca. 15 Metern wird eine Linie gezogen. Eine Person aus der ersten Mannschaft nimmt dann den Ball und versucht damit die Steine zu treffen und sie somit zu Fall zu bringen. Trifft der Ball den Steinturm, versucht die werfende Mannschaft zu fliehen, während die andere Mannschaft, die sich in der Nähe des Steinturms befindet versucht mit dem Ball die Spieler*innen der gegnerischen Mannschaft zu treffen.



Gava gog li listikvanê ku keviran datîne ser hev, bikeve, ew listikvan ji listikê dişewite û heqê wî yê nijinandîna keviran namîne. Koma ku hopik (mak, pîrik) e, berî ku heft ber li ser hev bên nijinandin, karibe gogê li hemû endamên komên ku pev direvin xîne, di listikê de bi ser dikeve û dora listikê diçe ser koma din.

Die fliehende Mannschaft versucht nun die Steine wieder aufeinander zu legen. Falls eine Person getroffen wird, die gerade die Steine berührt, scheidet sie aus dem Spiel aus. Schafft es die Mannschaft nicht den Turm wiederaufzubauen bis alle Spieler*innen getroffen wurden, dann gewinnt die gegnerische Mannschaft und ist nun an der Reihe.

Navê Lîstîkê / Name des Spiels

ŞERTÊ AN JÎ CINAQ

LADES (WETTEN)

Cîyê ku Lîstîk lê Tê Lîstin: Li Gellek Bajarên
Kurdîstanê

Kê vegot: Sevgi ilbey

Kê jê re vegot: Dapîra wî

Bi çend kesan tê lîstin: Du kes

Kelûmel: Hestîyê şertê yê mirîşkê an jî du zilîk

Temenê ku lîstîk tê lîstin: 4+

Wo das Spiel gespielt wird: In vielen Provinzen
Kurdistans


Erklärt von: Sevgi ilbey

Gelernt durch: Ihre Großmutter

Anzahl der Spieler*innen: 2 Personen

Benötigte Gegenstände: Hühnerknochen

Altersempfehlung für das Spiel: 4+



Armanca vê lîstikê ew e ku kesek tiştêk bide kesê din û di şertgirtinê de wî bixapîne û bêje şertê min û wî bibe. Di vê lîstikê de, bi giştî kesê ku bi ser dikeve, tiştêk jî qazanc dike, ji ber ku ev lîstikeke şertê ye.


Çawa Tê Lîstin:

Ji her du alîyan kesek, dipirse û dibêje, "Bila şertê min şertê te be?" Lîstikvanê din dibêje, "Erê" û lîstik dest pê dike. Armanca her du lîstikvanan ew e ku kesê din nebêje "şertê min an jî di bîra min de" û tiştêk bide destê wî. Loma jî, gava lîstikvan tiştêk bidin destê hev yê hildayî nebêje, "şertê min an jî di bîra min de" lîstikê winda dike û wekî xelat çî belên dabe, mecbûr e bide lîstikvanê din. Bi piranî ev xelat, bastêq, meşlûr (benî), gûz, hinar û bihîv in.

Ziel dieses Spiels ist es, einer Person einen Gegenstand zu geben und sie dazu zu bringen „Lades“ zu sagen. Am Ende des Spiels bekommt der Gewinner in der Regel einen Preis, da es sich um ein Wettspiel handelt.

Spielanleitung:

Eine der beiden Personen sagt: „Die Wette (Lades) steht?“. Willigt die andere Person ein, beginnt das Spiel. Ziel des Spiels ist es, dem jeweils anderen Spieler einen Gegenstand zu geben und ihn dabei sagen zu lassen: „Daran habe ich gerade gedacht.“ Falls die Person, die den Gegenstand nimmt, das nicht sagt, gewinnt sie und bekommt vom Verlierer den versprochenen Preis. In der Regel sind das Nüsse, Früchte oder Wurst.



Navê Lîstikê / Name des Spiels

MÎR Û CENDIRME (LÎSTIKA NIFTIKÊ)

MIR Û CENDIRME („HERR UND GENDARM“ BZW. STREICHHOLZSPIEL)

Ciyê ku Lîstik lê Tê Lîstin: Li Gellek Bajarên Kurdistanê

Kê vegot: Fatih Bucak

Kê jê re vegot: Ji gellek kesan

Bi çend kesan tê lîstin: Sînor ji bo hejmara lîstikvanan tune ye.

Kelûmel: Ji bo lîstikê, qutîya niftikê (Divê yek ji beşa dirêj ya qutîyê bê îşaretkirin. Aliyên kêlekî jî wekî aliyê bi wêne û bêwêne tîn îşaretkirin.) û pêşgîreke ku serîyek wê wekî zompê hatiye girêdan û ji bo qada lîstikê jî zemîneke rastepêhn û berfireh, pêwîst e.

Temenê ku lîstik tê lîstin: 6+

Wo das Spiel gespielt wird: In vielen Provinzen Kurdistans

Erklärt von: Fatih Bucak

Gelernt durch: Viele verschiedene Menschen

Anzahl der Spieler*innen: Nicht begrenzt

Benötigte Gegenstände: Streichholzsachtel (eine der beiden langen Seiten muss markiert werden, sowie eine der flachen Seiten durch ein Bild o. ä. markiert sein); gerolltes Handtuch

Altersempfehlung für das Spiel: 6+



Her çî qas ev lîstik wekî lîstika zarokan tê zanîn jî mezin jî gelek caran dilîzin. Ev lîstik, bi giştî li gelek bajarên Kurdistanê, di roja îroyîn de jî tê lîstin. Zêdebûna hejmara lîstikvanan dike ku kelecaniya lîstikê zêdetir be. Di vê lîstikê de lîstikvan kêfê dikin, kelecani dibin û belkî hinek jî ditirsin, hewl didin ku heyfa xwe hilînin, bi ceza dikin, tèn cezakirin û fermanê didin û hildidin. Di vê lîstikê de zarok çalak in.

Her çî qas ji bo kêfîkirinê tê lîstin jî, lîstika niftikê, fikira desthilatê û biryarên kêfî yên cezakirinê yên desthilatê rexne dike. Di gava lîstinê de, yek ji lîstikvanan, li gorî pozîsyona qutîya niftikê dikare were cezakirin, dikare bi ceza bike, dikare fermanê bide û hilde an jî dibe ku heta dawîya lîstikê qet neyê bicezakirin jî. Li gorî rewşa cezayê yê di lîstikê de, zarokên ji her temenê dikarin di vê lîstikê de cî bigirin.

Çawa Tê Lîstin:

Hemû lîstikvan, li erdê wekî xelekê rûdinên û lîstikvanek qutîya niftikê diavêje hewayê û lîstik dest pê dike. Qutîya niftikê bi tilîya beranê û tilîya nîşanekê tê girtin û li wê navê tê avêtin. Her lîstikvan bi dorê, qutîya niftikê diavêje û dora xwe dike. Heke yek ji lîstikvanan qutîya niftikê qûç bîne, ew lîstikvan dibe Mîr. Lîstikvanê bûye Mîr, êdî yê fermandar e û heta ku yekî din bibe Mîr, listikeke bêtengasî dilîze.

Ji ber ku Mîr qet cezayê hilnade. Mîr biryarê dide ka lîstikvan wê bi tundîyeke çawa were bicezakirin. Lîstikvanê ku cezayê pêk tîne, cendirme ye. Pêşgîra ku serê wê wekî zompê ye û alava cezakirinê ye, di destê cendirme de ye. Mîr di heman demê de dikare bibe cendirme jî. Ji bo vê tenê divê aliyê çik û îşaretkirî ya qutîya niftikê qûç bide sekinandin. Mîr di vî halî de dibe cendirme jî. Çî qas û çawa bixwaze dikare bi pêşgîrê lê xe.

Mîr û cendirme nikarin di lîstikê de her lîstikvan bi ceza bikin. Tenê dikarin lîstikvanê ku aliyê teniştkî yê qutîya niftikê ku li serê dinivîse "Diz" tîne, bi ceza bikin. Diz dikare bi du awayan jî cezakirinê xelas bibe. A yekê, gava dora avêtina qutîya niftikê were ser wî dikare rûyê din yê qutîya niftikê bîne. Ya duyan jî, divê lîstikvanekî din rûyê qutîyê ku li serê dinivîse "Diz" bîne. Bi vî awayî dizê nû dîyar dibe û yê kevn jê xelas dibe. Wekî din, rêya xelasbûna ji cezayê ya din jî, efûkirin e û bi femandana Mîr ya bi gotina, "Carek û ne tund" bi awayekî sivik tê cezakirin.

Obwohl dieses Spiel als Kinderspiel angesehen wird, spielen es auch Erwachsene sehr gern. Gespielt wird es in zahlreichen kurdischen Städten. Spannend wird es, durch eine große Zahl an Spieler*innen. Bei diesem Spiel amüsieren sich die Teilnehmer sehr, regen sich auf, bekommen Angst, versuchen sich zu rächen oder werden sogar bestraft. Dabei werden alle aktiv ins Spiel einbezogen.

Auch wenn es sich um ein sehr unterhaltsames Spiel handelt, kritisiert es das System der Willkür der Behörden. So wird während des Spiels je nach Position einer Streichholzsachtel ein Spieler bestraft, ein Befehl erteilt oder ein Befehl ausgeführt. Außerdem kann das Spiel auch ohne Strafe beendet werden. Kinder jeden Alters können an dem Spiel teilnehmen, da die Regeln entsprechend angepasst werden können.

Spielanleitung:

Alle setzen sich auf den Boden im Kreis, ein Spieler wirft die Streichholzsachtel in die Luft und das Spiel beginnt. Nun wird reihum die Sachtel hochgeworfen, wobei sie mit Zeigefinger und Daumen festgehalten wird. Die Person, bei der die Streichholzsachtel aufrecht landet, wird zum Mir erklärt, also zum Herrn. Dieser erteilt Befehle und hat somit eine sehr entspannte Rolle, zumindest solange niemand anderes die Rolle übernimmt, denn er kann selbst keine Strafe bekommen. Der Mir entscheidet in welchem Maß die anderen Spieler bestraft werden sollen. Ausgeführt wird die Strafe vom Gendarm, welcher zu diesem Zwecke das zusammengerollte Handtuch in den Händen hält.

Der Mir kann auch gleichzeitig Gendarm sein, wenn er es geschafft, dass die markierte kurze Seite der Streichholzsachtel nach oben zeigt. Dann kann er die anderen Spieler mit dem Handtuch so viel bestrafen, wie er will. Jedoch können der Mir und der Gendarm nicht einfach jeden bestrafen.

Es kann nur der sogenannte Dieb bestraft werden, also die Spieler, bei denen die flache Seite mit dem Kreuz oben auf dem Boden landet. Jedoch gibt es zwei Möglichkeiten, einer Bestrafung zu entgehen. Entweder gelingt es ihm, wenn er das nächste Mal an der Reihe ist, die Streichholzsachtel in einer anderen Position landen zu lassen, oder ein anderer Spieler wirft die „Diebes-Position“. So wird der eine Spieler durch das Unglück des nächsten gerettet. Es gibt jedoch noch eine weitere Möglichkeit einer Bestrafung zu entgehen, nämlich die der Amnestie bzw. eine äußerst leichte Ausübung der Strafe durch Anordnung des Mirs.

Di lîstikê de lîstikvan hene ku qet fermanê nadin, lê nadin û lêdanê naxwin. Ev lîstikvan, her tim gava qutîyê diavêjin rûyê wê yê bi wêne tînin ser. Ew lîstikvan cureyekî parêzbendên lîstikê ne. Her lîstikvan, bi dorê qutîya niftikê diavêje qada lîstikê û lîstika niftikê hey bi vî awayî didome.

Außerdem gibt es auch noch diejenigen Spieler, die weder Befehle erteilen, Schläge austeilen oder geschlagen werden. Diese Spieler schaffen es die Streichholzschatel so zu werfen, dass die bebilderte Seite oben landet. Das Spiel geht immer weiter und die Spieler werfen abwechselnd die Streichholzschatel.



Navê Lîstikê / Name des Spiels

BILA QAZÊN MIN TÊKEVIN HUNDIR

KOMMT, MEINE GÄNSE!

Cîyê ku Lîstik lê Tê Lîstin: Li Gellek Bajarên
Kurdîstanê

Kê vegot: Mustafa Ergün

Kê jê re vegot: Dapîra wî

Bi çend kesan tê lîstin: Herî kêr bi heşt
kesan tê lîstin

Kelûmel: Ji bo ku çember li ser axê bê xêzkirin,
şivek pêwîst e.

Temenê ku lîstik tê lîstin: 5+

Wo das Spiel gespielt wird: In vielen Provinzen
Kurdîstans


Erklärt von: Mustafa Ergün

Gelernt durch: Seine Oma

Anzahl der Spieler*innen: Mindestens 8 Personen

Benötigte Gegenstände: Stock

Altersempfehlung für das Spiel: 5+



Çawa Tê Lîstin:

Bi gelemperî hejmara lîstikvanên vê lîstikê zêde ne. Di vê lîstikê de, çend lîstikvan dibin gur, çend jê dibin xwediyên qazan û yên mayî jî dibin qaz. Xwediyê qazan gazî qazan dike û lîstik dest pê dike. Qaz nikarin ber bi xwediyê xwe ve bîn ji ber ku gur li ber wan sekinandî ne. Qaz bi lez û bez berpêyî xwediyê xwe ve dibezin lê gur êrîş dibin ser wan. Qaz hewl didin heta ku ji wan bê xwe nexin destê guran û xisar ji wan nebînin û xwe bigihînin xwediyê xwe û têkevin nav çembera ku xwediyê wan tê de ye. Di vê gavê de xwediyê qazan ji bo ku qaz têkevin nava çemberê wiha deng li wan dike.

Xwedî: Haydê qazno têkevin hundir.

Qaz: Em ditirsin.

Xwedî: Hûn ji kê ditirsin

Qaz: Ji guran

Xwedî: Gur li ku ne

Qaz: Li dorhêla me

Xwedî: Çi dixwin

Qaz: Xurme

Xwedî: Bi ser qazan de diqîre û qaz bi bayê bezê ber bi xwediyê xwe ve dibezin. Ew ên ku li derveyî çemberê dimînin, ji lîstikê dişewitin û jê der dibin.

Spielanleitung:

Es handelt sich hierbei um ein Spiel, das in der Regel mit sehr vielen Personen gespielt wird. Dabei teilen sich die Spieler auf und übernehmen drei unterschiedliche Rollen. Es gibt Wölfe, Gänsebesitzer und vor allem Gänse.

Das Spiel beginnt damit, dass die Gänsehalter ihre Gänse rufen, doch können die Gänse nicht einfach zu ihnen kommen, weil die Wölfe ihnen auflauern. Wenn die Gänse jedoch versuchen zu ihren Ställen, welche auf den Boden markierte Kreise sind, die mit einem Stock gezogen wurden, zu rennen, dann greifen die Wölfe sie an. Also müssen sie versuchen den Kreis um die Gänsehalter zu betreten, ohne von den Wölfen erwischt zu werden. Währenddessen rufen die Gänsehalter: „Kommt, meine Gänse, kommt rein!“ Und die Gänse antworten: „Wir haben Angst!“

Gänsehalter: „Vor wem habt ihr Angst?“

Gänse: „Vor den Wölfen.“

Gänsehalter: „Wo sind denn die Wölfe?“

Gänse: „Überall.“

Gänsehalter: „Und was essen sie?“

Gänse: „Datteln.“ Dann ruft der Gänsehalter nach den Gänsen und diese rennen, so schnell es geht, zu ihm und versuchen den Kreis zu betreten. Schaffen sie das nicht, scheiden sie aus dem Spiel aus.



Navê Lîstîkê / Name des Spiels

ŞIVAN Û GUR

HIRTE UND WOLF

Cîyê ku Lîstîk lê Tê Lîstin: Li Rojhilata Kurdistanê
pir zêde tê lîstin.

Kê vegot: Ali Kamber Aygün

Kê jê re vegot: Dapîra wî

Bi çend kesan tê lîstin: Pazdeh kes û zêdetirê
wê hejmarê tê tercihkirin.

Kelûmel: Ne hewceye

Temenê ku lîstîk tê lîstin: 6+

Wo das Spiel gespielt wird: In vielen Provinzen
Kurdistans

Erklärt von: Ali Kamber Aygün

Gelernt durch: Seine Oma

Anzahl der Spieler*innen: Mindestens 15 Personen

Benötigte Gegenstände: Keine

Altersempfehlung für das Spiel: 5+



Çawa Tê Lîstin:

Ev lîstik bi gelemperî li herêmên çîyayî yên Kurdistanê tê lîstin. Zivistanê di stareyên bi navê kon ku ji bo ajalan tê çêkirin û havînan jî di qadên servekirî de tê lîstin. Lîstikvanên di lîstikê de, gur, şivan û mî ne. Di nava wan de ya herî bihêz gur ya herî bêhêz jî mî ne. Ji bo hejmara zarokên ku tê de dilîzin sînor tune ye. Çi qas zêde zarok hebe lîstik ew qas bi coş û kelecana dibe.

Di lîstikê de zarokên ku bi rola mîyan radibin, bi hev digirin û li dora şivanê kom dibin. Şivan bi kîjan alî ve biçe ew jî bi wî alî ve diçin. Zarokê ku di lîstikê de bi rola gur radibe (Bi giştî ji alî laşî ve zarokê girs tê tercîhkirin) dikeve kemîne û ji bo ku êrîşî mîyan bike, dimîne li bendê. Helbet şivan ji mîyên xwe re dibêje, divê ew pir baldar bin û ji pey wî neqetin.

Di wê gavê de, gur ji bo êrîşkirinê dadiberize û êrîş dibe ser mîya herî lawaz ya di komê de û tê dixebite ku wê bigire. Di wê kêliyê de mîyên din naxwazin hevala xwe bidinê. Şivan jî dadiberize ser gur û dixwaze wî dûr bixîne. Gava gurî diqefêle jî tê dixebite ku li wî xe. Gur her tim bala xwe li ser çiyekî dihêle. Mîya herî lawaz ku gur êrîş bîriye serê, ji lîstikê dişewitîne û ew mî (zarok) ji lîstikê der dibe. Gava gur hemû zarokan ji komê an jî ji zincîra wan diqetîne û ji lîstikê dişewitîne, lîstik bi dawî dibe û rolên lîstikê car din li zarokan tê belavkirin û wek wisa lîstik didome.

Spielanleitung:

Dieses Spiel wird vor allem in den Bergregionen Kurdistans gespielt. Im Winter spielt man es in den Schutzhütten, den sogenannten Kon, und im Sommer auf offenem Feld. Das Spiel kann mit beliebig vielen Personen gespielt werden. Je höher die Anzahl der Mitspieler ist, umso spannender ist das Spiel.

Alle Spieler sind entweder Wölfe, Hirten oder Schafe. Dabei sind die Wölfe die Starken, während die Schafe die Schwachen sind. Zu Beginn des Spiels bilden die Schafe einen Kreis um den Hirten und halten sich aneinander fest.

Wohin der Hirte auch geht, die Schafe folgen ihm. Währenddessen lauert die Person, die die Rolle des Wolfes inne hat (in der Regel ein größeres Kind), darauf, die Schafe anzugreifen, weswegen der Hirte natürlich die Schafe ständig darauf hinweist, dass sie aufpassen müssen.

Wenn der Wolf zum Zug kommt, greift er an und versucht das schwächste Schaf der Gruppe zu entführen. Die anderen Schafe versuchen es zu verteidigen, während der Hirte versucht den Wolf zu vertreiben. Falls er das schafft, schlägt er ihn. Der Wolf konzentriert sich immer auf einen Punkt. Wenn er es schafft ein Schaf zu entführen, schafft er es zur Seite und dieses Kind scheidet aus dem Spiel aus. Das Spiel endet, wenn alle Schafe vom Wolf entführt wurden. Dann beginnt eine neue Runde, bei der die Rollen neu verteilt werden.

Navê Lîstikê / Name des Spiels

BIRÊ (CIR, CIRÊ,
CIRAN, BIRANÎ)

BIRÊ (ODER CIR, CIRÊ,
CIRAN, BIRANÎ)

Cîyê ku Lîstik lê Tê Lîstin: Li Gellek Bajarên
Kurdîstanê

Kê vegot: Muhammed Kaya

Kê jê re vegot: Bapîrêwî

Bi çend kesan tê lîstin: Çarde kes

Wo das Spiel gespielt wird: Im Osten Kurdistans

Erklärt von: Muhammed Kaya

Gelernt durch: Seine Großmutter

Anzahl der Spieler*innen: 14

Birê, lîstikeke sporî ye ku bi sedan salan in li Mezopotamyayê tê lîstin. Ev lîstika ku tê wateya “birîna rê” wekî spora xweza, çand, dîrok û piştevaniya civakî tê zanîn. Kesên ku cara pêşî vê lîstikê dibînin, rengê “Futbolê Amerîkayê” didinê lê belê em baş pê dizanin ku lîstika Birê (Cirê) bêgog tê lîstin. Ji bo lîstika Birê, efor û hêzeke pir zêde pêwîst e. Tê gotin ku Futbola Amerîkayê ji lîstika Birê hatiye afirandin. Lê belê di vê der heqê de agahîyeke zelal û teqez tune. Tenê em dizanin ku lîstikan bes ji hev hildane. Hem di “Futbola Amerîkayê” hem jî di lîstika “Birê, Cir, Cirê” de armancên xwegihandina kelehê, têkoşan, êrîşkirin û berevaniyê hene. Yanî du lîstik hene ku mîna hev tê lîstin û bi navên cuda tên binavkirin û yek jê bi gog ya din bêgog tê lîstin. Di “Futbola Amerîkayê” de armanc gihandina gogê bo kelehê ye. Di lîstika Birê de jî, kîjan alî bilez û laşvîk be lîstikê qazanc dike.

Bei Birê, was soviel wie Straßensperre bedeutet, handelt es sich um eine sehr alte Sportart, die seit Jahrhunderten in Mesopotamien gespielt wird. Es ist aus kultureller, historischer und gesellschaftlicher Hinsicht ein Sport der Solidarität. Viele erkennen Ähnlichkeiten zum American Football, jedoch wird es ohne Ball gespielt. Gleichzeitig ist es ein Spiel, das sehr kraftaufwendig ist. Manche nehmen auch an, dass sich der American Football aus dem Birê-Spiel entwickelt hat, allerdings fehlen hierfür verlässliche Quellen. Wir wissen nur, dass die Spiele sich gegenseitig inspiriert haben. In beiden Spielen geht es darum, einen Treffer ins gegnerische Tor zu bringen, also um Angriff und Verteidigung. Nur die Namen der Spiele unterscheiden sich und die Tatsache, dass das eine Spiel ohne Ball gespielt wird und das andere mit Ball. Während man beim American Football das Ziel mit dem Ball in der Hand erreichen muss, muss bei Birê nur der Spieler das Ziel erreichen. Gewinner ist derjenige, der besonders klug und schnell ist.

Çawa Tê Lîstin:

Lîstika "Birê, Cir, Ciran"ê, bi du tîmên ku her yek ji heft kesan pêk tîn, tê lîstin. Di vê lîstikê de bi temamî 5 dan hene ku her danek 15 deqe dikude. Kîjan alî 3 dan qazanc bike, maçê jî qazanc dike.

Di dema lîstikê de, yek ji tîman êrîş dike ya din jî berevanîyê dike. Armanca lîstikvana ya di lîstikê de ew e ku hewl didin ku di nav lîstikvanên tîmên berevanîyê re bibihurin û bigihîjin kelehê. Di vê lîstikê xwe gog tune ye. Berî ku lîstik dest pê bike pişk tê avêtin û tê dîyarkirin ka wê kîjan tîm êrîşê bike kîjan berevanîyê bike.

Gava lîstikvanekî ji tîma êrîşê xwe bigihîne kelehê lîstik bi encam dibe. Ji bilî vê jî, piştî ku lîstikvanên tîma berevanîyê hemû lîstikvanên tîma êrîşê berband dîkin û ji lîstikê dişewitînin, lîstik bi encam dibe. Her wekî di futbolê de û di lîstikên din yên tîmî û komî de jî wisa ye, di vê lîstikê de jî kaptan heye û kaptan dîyar dike ka wê lîstikvan bi kîjan awayî di nav qadê de cî bidin xwe.

Gava lîstikvanekî tîma berevanîyê destê xwe di lîstikvanekî tîma êrîşê bide, ew lîstikvanê tîma êrîşê dişewite û der-lîstik dibe. Lîstikvanên din yên mayî lîstikê didomînin. Gava lîstikvanekî ji tîma êrîşê xwe bigihîne kelehê lîstik tê qazanckirin. Di lîstikê de, beşek heye ku nêzî kelehê ye û em wê wekî qada cezayê bi nav dîkin, qedexe ye ku lîstikvanên berevanîyê bikevin nava vê qadê.

Spielanleitung:

Dieses Spiel wird in zwei Mannschaften zu je sieben Spielern gespielt. Ein Spiel dauert 15 Minuten und besteht aus fünf Etappen. Wer mindestens drei der Etappen gewinnt, wird Sieger des Spiels.

Während des Spiels befindet sich eine Mannschaft im Sturm und die andere in der Verteidigung. Ziel des Spiels ist es, dass die Spieler der angreifenden Mannschaft das Ziel erreichen, jedoch versucht die gegnerische Mannschaft das Ziel zu verteidigen. Festgelegt werden die beiden Teams mittels Los. Eine Spieletappe endet, wenn ein Spieler der angreifenden Mannschaft das Ziel erreicht.

Wie im Fußball und bei anderen Mannschaftssportarten gibt es bei Birê einen Kapitän, der sich um die Aufteilung der Spieler auf dem Spielfeld kümmert.

Falls ein Spieler der Verteidigung einen Spieler des Sturms berührt, scheidet dieser aus dem Spiel aus. Die zurückbleibenden Spieler setzen das Spiel fort. Falls ein Spieler der angreifenden Mannschaft es schafft, das Ziel zu erreichen, dann ist die Etappe gewonnen. Den Spielern der Verteidigung ist es nicht erlaubt den sogenannten Strafraum zu betreten, welcher sich in der unmittelbaren Umgebung des Ziels befindet.



Navê Rîtûelê / Name des Rituals

BÛKA BARANÊ

(„DIE BRAUT DES REGENS“)
EIN RITUAL AUS KURDISTAN

Cîyê rîtûelê tîn kirin: Li Kurdistanê

Kê vegot: Ali Riza Kiling

Kê jê re vegot: Bapîrêwî

Wo das Ritual abgehalten wird: In Kurdistan

Erklärt von: Ali Riza Kiling

Gelernt durch: Seinen Großvater

Rîtûela “Bûka Baranê” ji alî zarokan ve tê bicîanîn. Di zaroktiya me de, darikê dirêj wekî xaçê bi hev ve dihat zeliqandin û wekî bûkê dihat xemilandin. Navê wî darikê ku zarokan ew dixemiland, “Bûka Baranê” bû. “Bûka Baranê” wekî navê xwe wateya xwe hildida. Di heman demê de bi wateya keskesorê jî dihat zanîn.

Das Ritual Buka Baranê wurde in unserer Kindheit immer von Kindern durchgeführt. Dazu wurde an einem langen Baumstamm kreuzförmig ein weiterer Stock befestigt und dieser dann als Braut geschmückt. Diesen geschmückten Baum nennt man Buka Baranê, was soviel wie „Braut des Regens“ bedeutet. Gleichzeitig ruft es auch den Regenbogen in Erinnerung. Wenn der Baum fertig dekoriert ist, nimmt das kräftigste Kind den Baum und alle Kinder gehen damit gemeinsam durchs Dorf und ziehen von Haus zu Haus. Dabei rufen alle Kinder zusammen: „Schaut her, Buka Baranê ist da. Gebt ihr, was ihr zusteht!“ Damit fordern sie die Dorfbewohner auf sich am Ritual zu beteiligen. Daraufhin spritzen die jungen oder die alten Frauen der Häuser Wasser auf die Buka Baranê, während sie dafür beten, dass es regnen möge. Die Kinder antworten auf diese Gebete mit einem „Amen“.



Piştî xemilandinê, Bûka Baranê didan destê zarokekî bihêz û di nava gund de digerlandin. Zarokan bi hev re digot, “Bûka Baranê hat/Bûka Baranê hat/Ka bidin para wê” û ji xwediyên malan hin tişt dixwestin. Di vê navê de, keça ciwan, jina salmezin an jî bûka wê mala ku çûbûnê, av direşand ser Bûka Baranê. Gava av dihat reşandin bi gotina, Xwedê bikim wê baranê bîne, dua dihat kirin. Herçî zarok in, dîsa bi bi hev re û bi yekdevî ji bo duayan digot, amîn.

Çawa Tê Lîstin:

Zilamên malê av nedireşandin. Ji ber ku “Bûka Baranê” ya ku ji alî zarokan ve dihat gerandin, jin bû divîya jinan av lê bireşanda. Sedema vê yekê ew e ku; di navbera zayokîya jinan û berdarîyê de pêwendîyek dihat saz kirin. Piştî ku ev yek dihat bicîanîn, zarok ji wê malê diçûn û berê xwe didan maleke din. Ji mala ku jê diçûn xurekên wekî genim, şeîre û rûn didan hev. Dihat bawer kirin ku piştî vê ritûela ku zarokan bi cî dianî, wê baran bibarîya. Malxwêyan di vê dabaşê de pir pêjnkar tevdilivîyan. Ji ber ku dihat bawer kirin ku zarok pir narîn, pak û bêrî ne, loma wisa tevdilivîyan.

Piştî ku xurekên wekî genim û rûn dihat berhev kirin, li gastîna gund, agir dihat dadan û mencil datanîn ser agir û xurekên hatî berhev kirin dihatin pijandin û hemû zarokan jê dixwar. Di vê navê de, mezinên gund jî di vê çalakîyê de cî digirt.

Tê bîra min, me di dawîya salên 1980yî de cara dawî ev ritûel bi cî anî. Lê belê piştî ev ritûel li gundê me nehat bicîanîn û her ku çû hem li gundê me hem jî li gelek herêmên Kurdistanê hat jibîr kirin. Di vê ritûelê de armanc; anîna baranê ye da ku di wê sal û demsalê de hişkayî û ziwatî çênebe. Bi awayekî giştî, sedema bicîanîna van ritûelan, xizmetkirina armancên civakî ye.


Wekî din jî, kargîniya yekem ya vê ritûelê anîna baranê û bihurandina saleke bi xêr û bereket e û kargîniya duyem jî, xurtkirina pêwendiyên civakî ye. Helbet, gava me ev ritûel bi cî dianî, me wîşx û birayên xwe yê ji me biçûktir jî bi xwe re dibirin û hînjî wan dikirin da ku ew jî li dû me karibin vê ritûelê bi cî bin.

Spielanleitung:

Es ist jedoch nicht erlaubt, dass die Männer Wasser spritzen, denn es handelt bei der Buka Baranê, die von den Kindern getragen wird, um eine Frau. Deswegen muss auch die Person, die das Wasser verspritzt, eine Frau sein. Grund dafür ist die Verbindung von Bodenfruchtbarkeit mit der Fruchtbarkeit der Frau. Dann ziehen die Kinder weiter zum nächsten Haus. Gleichzeitig bekommen sie von den Dorfbewohnern auch etwas zu Essen geschenkt, wie etwa Weizen, Öl oder Nudeln. Es ist selbstverständlich, dass die Kinder von jedem Haus etwas bekommen. Darauf achten die Dorfbewohner sehr, denn die Kinder sind in der Regel sehr aufmerksam und lieb.

Es wird allgemein angenommen, dass es nach der Durchführung dieses Rituals regnen würde. Nachdem der Zug durchs Dorf beendet wurde, wird auf einem Platz außerhalb des Dorfes ein Feuer gemacht und das gesammelte Essen darauf zubereitet und von allen Kindern gemeinsam gegessen. Auch die Erwachsenen nehmen an diesem Essen teil.

Ich erinnere mich, dass das Ritual in meinem Dorf das letzte Mal in den 80er Jahren durchgeführt wurde. Inzwischen ist es aber in unserem Dorf und in vielen Teilen Kurdistans vergessen. Ziel des Rituals ist es, den Regen zu erbitten und somit eine Trockenzeit enden zu lassen. Doch zugleich hat es auch eine soziale Funktion. So wird es beispielsweise von den älteren Kindern an die jüngeren Kinder weitergetragen, was es zu einer Tradition werden lässt.



Navê Rîtûelê / Name des Rituals

SERÊ SALÊ

(„DER ANFANG DES JAHRES“)

Cîyê ritûel lê tèn kirin: Li Kurdistanê

Kê vegot: Akram Hidou

Kê jê re vegot: Bapîrêwî

Wo das Ritual abgehalten wird: In Kurdistan

Erklärt von: Akram Hidou

Gelernt durch: Seinen Großvater



Çawa Tê Lîstin:

Li dinyayê gelek welat serê salê li ser salnameya Zayînî (Mîladi) Kurd li ser salnamaye Julien pîroz dikin. Cudatîya di navbera wan de jî ev e ku sala nû li gorî salnameya Hicrî piştî 13 rojan ya salnameya Zayînî dest pê dike. Gel û welatên ku salnameya Zayînî bi kar tînin di 1ê Rêbendanê de, gel û welatên ku salnameya Hicrî bi kar tînin jî di 13ê Rêbendanê de serê salê pîroz dikin.

Serê salê, roja îroyîn, li hin herêmên Kurdan tê pîrozkirin. Di van salên dawîyê de jî, li hin bajarok û bajarên Kurdistanê tê pîrozkirin. Bi taybetî di warên wekî Amed (Farqîn), Batman, Mêrdîn (Qoser-Nisêbin) hewldanek heye ji bo domandina vê adet û gerdîşê. Tew ji bo ku ev gerdîş nemire û bidome, şaredarîyên li Kurdistanê, SSC (SazîyênSivil yên Cîvaki) û navendên çandî bi coşdarî û kelecani serkêşîya vê pîrozkirinê dikin.

Pîrozkirina serê salê ya li ba Kurdan pir bi bezm û şahî çêdibe. Bi giştî, zarok di van pîrozkirinan de li pêş in. Zarok di taxa xwe de li hev kom dibin. Zarokên keçin cilên bavê xwe, zarokên kurî jî kincên dê û xwişkên xwe li xwe dikin û dilqên xwe diguherînin û dibin jin û mêr. Di nava vê komê de Kalikê Sersalê heye. Kalikê Sersalê serkêşê koma gihîştî hev e. Zarokên ku gihîştine hev, mal bi mal digerin û tev bi hev re wiha dibêjin:

Serê salê / Binê salê / Xwedê zarokêkî bide /
Kevaniya malê (Vê malê)..

Piştî ku zarok qewlêrkên (dûrikên) xwe dibêjin û skêcên xwe dilîzin, malxwê diyarîyên cuda cuda didin wan. Ev diyarî bi giştî xurekên wekî Meşlûr (Benî), Gûz, Bihîv, Pirteqal, Sêv in.

Spielanleitung:

In vielen Ländern der Welt wird Neujahr nach dem Gregorianischen Kalender gefeiert, während die Kurden sich nach dem Islamischen Kalender richten. Nach diesem Kalender beginnt das Jahr 13 Tage später als im Gregorianischen Kalender, weswegen in Kurdistan am 13. Januar Neujahr gefeiert wird.

Das Sarê salê wird in sehr wenigen heutigen kurdischen Regionen gefeiert. In den letzten Jahren wurde es vor allem in den Städten und Provinzen, wie Diyarbakır (Silvan), Batman, Mardin (Kızıltepe-Nusaybin) und Siirt gefeiert. Dort wurde durch die Unterstützung der Kommunalregierung, durch NGOs und Kulturzentren diesem Fest eine besondere Bedeutung beigemessen.

Im Vordergrund dieses Festes steht der Spaß. Besonders wichtig sind dabei die Kinder, die sich jeweils in ihren Stadtvierteln treffen. Dabei tragen die Mädchen Kleider ihrer Väter und die Jungen Kleider ihrer Müttern oder großen Schwestern. Sie verkleiden sich also jeweils als Männer oder Frauen. Einer der Gruppe wird zum Kalikê Serêsalê („Neujahrs Großvater“) ernannt und ist somit der Anführer der Gruppe. Dann ziehen die Kinder durchs Viertel und singen alle gemeinsam folgendes Lied:

Zu Beginn des Jahres
Am Ende des Jahres
Der Frau dieses Hauses
Möge Gott ein Kind schenken ...

Daraufhin werden unterschiedliche Theaterstücke und Sketche aufgeführt, woraufhin die Bewohner und Bewohnerinnen des Stadtviertels den Kindern kleine Geschenke geben. In der Regel sind das Würste, Walnüsse, Mandeln, Orangen oder Äpfel.

Navê Rîtûelê / Name des Rituals

NEWROZ

NEWROZ

Cîyê ritûelê tîn kirin: Li Kurdîstanê

Kê vegot: Minewer Arslan

Kê jê re vegot: Bapîrêwî

Wo das Ritual abgehalten wird: In Kurdistan

Erklärt von: Minewer Arslan

Gelernt durch: Seinen Großvater




21ê adarê ji bo me kurdan cejna newrozê ye. Wextekî kesekî gelekî zilimkar heye, navê wî Dehak e, û zilmê li hemû însanan dike. Kawayê Hesinkar berxwedanê dike û wî zalimi têk dike. Piştî ku ew zalim têk diçe, Kurd û Kawa azad dibin li her aliye welat agir tên pêxistin. Loma di newrozê de em Kurd agir pê dixin û xwe di ser re davêjin. Newroz mizgîniya biharê û sembola serhildanê ye. Kurd roja newrozê cil û bergên xwe yên gelêrî li xwe dikin. Newroza malbata xwe pîroz dikin û derdikevin meydana. Lî meydana agirê mezîna pê dixin û li dora agir pev re dîlanê digirin. Stranên newrozê dibêjin.

Li hin cihên Kurdistanê Kurd roja newrozê diçin ser çiyayan û seyranê dikin. Xwarinên herî xweş çêdikin û pev re dixwin. Li ser çiyayan dîlanê digirin û newroza xwe bi dilekî geş pîroz dikin.

Li hin cihên Kurdistanê jî Kurd bi roj newroza xwe bi dîlan û stranên pîroz dikin. Êvarî her yekî pêtalêkê pêdixin û dimeşin ber bi Çiyayê Akreyê ve. Çiyayê Akreyê çiyayekî pîroz e. Xort û qiz bi agirê destên xwe êvarê ronî dikin. Agir him sembola hatina biharê ye him sembola serhildanê ye. Newroz ji Kurdan cejnê-ke pîroz e, roja azadiyê ye.

Der 21. März ist für uns Kurd*innen das Newrozfest. Vor langer Zeit soll es einen grausamen Tyrannen namens Dehak gegeben haben, der die Menschen seines Reiches terrorisiert hat. Kawa, der Schmied, widersetzt sich dem Tyrann Dehak und besiegte ihn. Nach der Niederlage des Tyrannen, soll Kawa, der Schmied, auf dem Dach des Tyrannenpalastes ein Feuer entzündet haben. Dieses Feuer sollte das Ende der Tyrannei und den Beginn eines neuen Tages verkünden (Newroz). Deshalb zünden wir Kurd*innen am Newrozfest ein Feuer an und überspringen es. Newroz ist der Frühlingsbote und ein Symbol der Rebellion. Kurd*innen tragen am Newroz-Tag ihre traditionelle Kleidung. Sie feiern Newroz mit Ihrer Familie und gehen zusammen zum großen Newrozfest. Am Newrozfest wird ein großes Feuer entzündet und herumgetanzt und Newroz-Lieder gesungen.

In einigen Teilen Kurdistans gehen die Kurd*innen am Newroz-Tag in die Berge und picknicken. Dafür werden die besten Speisen gekocht und es wird zusammen gegessen. In den Bergen werden traditionelle kurdische Volkstänze getanzt und das Newroz wird mit einem glücklichen Herzen gefeiert.




In einigen anderen Teilen Kurdistans wird Newroz auch mit Tänzen und Liedern gefeiert. Am Abend zieht jeder mit einer Fackel in Richtung des Berges Akrê. Der Berg Akrê ist ein heiliger Berg. Jungen und Mädchen erhellen den Abend mit den Fackeln. Feuer ist sowohl ein Symbol für den Beginn des Frühlings als auch ein Symbol der Rebellion. Newroz ist für die Kurd*innen ein heiliger Feiertag und der Tag der Freiheit.



ÇIROK

GESCHICHTEN





ÇARDO Û SÊZDE BIRAYÊ WÎ

ÇARDO UND SEINE 13 BRÜDER

Vebêjer: Asya û Yildiz Çakar

Erzähler: Asya und Yildiz Çakar

Hebû tunebû. Li warên gelek dûr, di nava erd û esman de welatek hebû û qralekî vî welatî hebû. Qral yekdayê malbata xwe bûye. Rûspiyên serayê her tim jê re gotine, „Divê êdî bizewicî, hewcetiya vê serayê bi dengê zarokan heye.“

Es war einmal vor langer, langer Zeit in einem fernen Land, zwischen Himmel und Erde. Dort lebte ein junger König. Der König war das einzige Kind der Familie und so übte der Ältestenrat des Palasts schon bald Druck auf den König aus: „Du musst dir eine Frau suchen.“



Qral, li ser gotinên wan zewiciye û ji zewaca wî kurek jê re çêbûye. Lê belê li gorî qaydeyên serayê hewce bûye hê bêtir zarok ji qral re çêbibin loma jî bi ser wî û jina wî de çûne. Jê re gotine, „Ger ev zarokê yekta rastî qezayekî bê û bimire wê seltênata te biqede.“

Pir sal jî tê de diçin lê zarok ji qral re çênabin. Li ser vê yekê qral ji mecbûrî careke din jî dizewice. Ji vê zewaca wî sêzdeh kur jê re çêdibin. Qral nav li hemû kurên xwe dike û bi demçûnê re kurê xwe yê pêşî jî bîr dike. Tew nizane jina wî ya pêşî û kurê wî li derveyî serayê, di xaniyek yekçavî de dimînin. Gelê wî welatî, navê kurê qral yê bênav dike „Çardo“. Ew zarokê pêşî ye lê êdî wekî yê çardehan tê zanîn.

Roj û meh û sal didin dû hev. Qral, jina wî û 13 kurên wî salên bextewar dibihurînin. Û rojekê rûspiyan serayê diçin li pêşberî disekin û dibêje wan:

„Cenabê qralê me. Wekî hûn dizanin zarokên we mezin bûn û hatine ber zewacê. Lê hûn jî dizanin, ji bo aqûbeta serayê, 13 kurên we ji bo ku bibin bûka we gere 13 keçên xwişkên hev peyde bikin. Heke bûkên we ji malbatên cuda bin wê ev yek me parçe bike. Wê xisar bigihîje malbata qral. Çareya herî baş ew e em ji malbatekê 13 xwişk peyde bikin.“

Ev gotin dikevin aqilê qral û 13 kurên xwe gazî hafa xwe dike û ji wan re dibêje:

„Ez ê hespên herî beza bidim we. Çi qas zêr û zîv hewce bike hûn dikarin bi xwe re bibin. Şertekî min tenê heye, hûn ê ji malbatekê 13 xwişk peyde bikin û bi wan re bizewicin. Heta hûn wan peyde nekin hûn ê venegerin serayê.“

Dieser Palast braucht Kinderstimmen.“ Der König hielt diesem Druck nicht stand und heiratete bald. Doch bekam er nur einen Sohn.

Aber die Gesetze des Palastes besagten, dass der König und seine Frau mehr als ein Kind bekommen müssen und so ließ der Druck auf den König nicht nach. Im Palast war Geflüster zu vernehmen, dass man sich sorgte, dass die Dynastie am Ende sei: „Wenn der König stirbt, wird das Erbe verloren sein und das Königreich enden.“ Aber es vergingen Jahre und die Frau des Königs gebar kein weiteres Kind. So war der König dazu gezwungen ein weiteres Mal zu heiraten. Und aus seiner zweiten Ehe entstanden 13 Söhne und mit der Zeit vergaß der König seinen ersten Sohn. Er wusste nicht einmal, dass seine erste Frau mit seinem Sohn in einer kleinen Hütte außerhalb des Palasts lebte. Das Volk jedoch gab dem Erstgeborenen den Namen Çardo und obwohl es das erste Kind war, wurde er immer der 14. Sohn genannt.

Es vergingen Tage, Monate und Jahre und der König, seine Frau und seine 13 Söhne lebten glücklich und zufrieden zusammen. Doch eines Tages traten die Ältesten des Palasts vor den König und sprachen: „Unser lieber großer König, Eure Kinder sind erwachsen und im heiratsfähigen Alter und Ihr wisst auch, dass für die Zukunft des Palastes Eure 13 Söhne 13 Bräute finden müssen. Wenn jede Braut aus einer anderen Familie kommt, würde das zum Zerfall des Königreichs führen und großen Schaden für die königliche Familie bedeuten. Die beste Lösung wäre, 13 Schwestern aus derselben Familie zu finden.“ Daraufhin rief der König seine 13 Söhne und sprach zu ihnen: „Ich werde euch die besten Pferde geben und soviel Gold und Silber, wie ihr verlangt. Ich habe nur eine Bedingung. Ihr werdet 13 Schwestern aus derselben Familie finden und sie heiraten. Und ihr werdet nicht in den Palast zurückkehren, bevor ihr sie gefunden habt.“



13 kurên qral xwe kar dikin. Di vê navê de Çardo û dêya xwe di xanîkê jî derveyî serayê de dibihîsin jineke cotyar dibêje:

„We nebihîst! Qral jî bo ku jin jî xwe re peyde bikin kurên xwe dişîne war û welatên din.“ Çardo gava vê gotinê dibihîse, pir li ber dikeve. Bi salan hem bavê wî pîrsa wî nekiriye hem jî wî jî bi birayên wî re naşîne welatên din. Loma xemgîn dibe. Gava dêya wî dibîne Çardo xemgîn e, ro dike û dipîve, paşê radibe diçe hafa qral û bi lavakirinê jê re dibêje.


„Cenabê qral. Çardo jî kurê te ye. Tu zêr didî 13 kurên xwe û jî bo jin jî xwe re peyde bikin wan dişîni welatên din. Heqê Çardo jî heye. Gere tu şans bidî wî jî.“ Qral pêşî qet bersivê nadiyê. Di dilê xwe de dibêje, „ne fikreke rast e ez rabim zêr û hesp bidim zarokê bêkêr. Lê heqîqet e, ew jî kurê min e.“ Qral tavilê tiştên di dilê wî de çêbûyî datîne aliyekî û dibêje:

„Ez ê şanseki bidimê. Ger vî şansî xweş bi kêrî xwe neyîne ew ê careke din nikaribe jî deriyê vê serayê têkeve hundir.“ Û fermanê dide xizmetkarên serayê jî bo zêr û zîv û hesp bidin Çardo. Gava dêya Çardo vê fermanê dibihîse jî kêfan re bask pê ve çêdibin. Û baz dide xeberê digihîne Çardo. Çardo jî wekî birayên xwe yên din tavilê xwe kar dike. Heta Çardo haziriyên xwe temam dike û dide ser rê, birayên wî jî zû de bi rê ketine jî.

So begannen die 13 Söhne des Königs sich auf die Reise vorzubereiten. Währenddessen erzählte eine Bäuerin Çardo und seiner Mutter von dem Vorhaben: „Habt ihr die Neuigkeiten gehört? Der König schickt seine Söhne zum Heiraten in ferne Länder.“ Als Çardo das hörte, wurde er sehr traurig. Seinen Vater hatte er seit Jahren nicht mehr gesehen und nun hatte er ihn auch nicht gefragt, ob er mit seinen Brüdern in fremde Länder gehen wolle. Das brachte seine Mutter zum Nachdenken und so ging sie schließlich zum König.

„Mein großer König, Çardo ist auch dein Sohn. Du gibst deinen 13 Söhnen Pferde und Gold und schickst sie in ferne Länder, um Frauen zu finden. Çardo hat genauso ein Recht darauf. Du kannst ihm diese Chance nicht verwehren,“ flehte sie den König an. Der König gab zunächst keine Antwort und dachte für sich: „Eigentlich ist es keine gute Idee einem nutzlosen Sohn Pferd und Gold zu geben, aber es stimmt, auch er ist mein Sohn.“

Und so schob der König diese Gedanken bei Seite und sprach: „Ich werde ihm eine Chance geben, doch wenn er diese Chance nicht nutzt, wird er niemals wieder durch die Tür dieses Palastes treten können.“ Daraufhin befahl er den Palastbeamten für Çardo ein Pferd zu satteln und ihm Gold und Silber zu geben.



Lê tu kesekî di serayê de nizane ka Çardo çi qas hespbeza û nêçîrvanekî çê û serketî ye. Gava Çardo digihîje birayên xwe, birayên wî bi gotinên, „Tew ka binêrin, kî hatiye! De îcar ew ê jî ji xwe re keç bibîne û wekî jin bîne. Ka kî te dike!“ tinaza xwe pê dikan. Çardo dengê xwe ji wan re nake. Çardo wekî zarokê 14an dide dû 13 birayên xwe û pir diçin hindik diçin, ji çiya û baniyan dibihurin û li deşt û bestan disekin. Û di dawiyê de mêrgeke têrgiya dibinin û bêhna xwe lê vedidin.


13 bira dibêjin:


„Ev mêrg pir xweş e. Em îşev konê xwe li vir daynin.“ Û 13 bira hespên xwe girê didin û ji bo ku xeweke xweş bikin agirekî gur pêdixin û cî ji xwe re çêdikin. Çardo, ji wan hinekî bi wê de diçe û li wir hespê xwe girê dide. Û ji bo ku çavdêriya derdora xwe bike, mîna ku ketibe xewê dike. Pir tê de naçe, dengin dibihîse. Û tavilê berê xwe bi aliyê deng jê tê dike. Dibîne heft hût berpêyî birayên wî diçin. Yekî ji wan dibêje:

„Kê destûr da wan wisa bêdestûr ketine nav mêrga me. Hemin bêdestûr ketin ew ê cezayê xwe jî hildin.“ Çardo çawa van gotinan dibihîse tavilê dide dû hûtan. Çardo kehanetên ji efsûnbazan bihîstî tîne bîra xwe û dizane gere firketên li ser kincên hûtan jê bike. Û Çardo firketên li ser kincên her heft hûtan jê dike, firket dixê çentikê xwe û wê şevê hem birayên xwe ji mirinê xelas dike hem jî hût bêfirket bi demeke zêde di xew de dimînin.

Çardos Mutter freute sich sehr darüber und eilte sofort zu ihrem Sohn, um ihm davon zu berichten. Çardo begann wie seine Brüder mit den Vorbereitungen. Als Çardo damit fertig war und sich auf den Weg machte, stellte er fest, dass seine Brüder bereits losgezogen waren ohne auf ihn zu warten. Doch niemand im Palast wusste, dass er gut ritt und was für ein guter Jäger er war. Als Çardo seine Brüder einholte, machten sie sich über ihn lustig und sagten: „Schaut, wer da ist! Und der will auch noch eine Frau finden und heiraten. Wer will dich schon?“ Çardo schweig und sagte nichts dazu. So folgte der 14. Bruder seinen 13 Brüdern. Sie ritten und ritten, überquerten Berge und durchquerten Täler und schließlich fanden sie eine schöne Wiese zum Rasten.

„Das ist ein sehr schöner Ort, lasst uns die Nacht hier bleiben,“ sagten die 13 Brüder und banden ihre Pferde an. Sie entzündeten ein Feuer und machten es sich gemütlich, damit sie gut schlafen konnten. Çardo hingegen entfernte sich ein wenig von ihnen und band sein Pferd dort fest. Um die Gegend auszukundschaften stellte er sich schlafend. Schon bald hörte er Stimmen. Als er seinen Blick in die Richtung der Stimmen richtete, sah er sieben Riesen, die wutentbrannt auf seine Brüder zuliefen. Einer der Riesen sagte: „Wer hat ihnen erlaubt unsere Wiese zu betreten? Dafür werden sie büßen.“ Als Çardo dies hörte, heftete er sich an die Fersen der Riesen, denn er erinnerte sich an die Prophezeiungen der Magier, in denen es hieß, dass man den Riesen die Sicherheitsnadeln aus ihren Kleidern nehmen müsse. So nahm Çardo die Nadeln von den Kleidern der sieben Riesen und steckte sie in seine Tasche. In dieser Nacht rettet er dadurch das Leben seiner Brüder, denn die sieben Riesen fielen sofort in einen tiefen und langen Schlaf. In der Prophezeiung heißt es, dass Riesen ohne ihre Nadeln nachts nicht wach bleiben können.





Li gorî kehanetê, ger fîrketên wan tunebe hût nikarin bi şev şiyar bimînin. 13 birayên haya wan ji van tiştan tune ye, piştî xewke xweş, bi berbanga sibehê re car din didin ser rê. Birayên dane ser rê, li ser hespên xwe, gava di ber wî ciyê Çardo vêsa xwe daniye re dibihurin, dibêjin:

„Ca tu li vî tirsonekî! Ew qas tirsonek e, ji me ew qas dûr çûye û vêsa xwe daniye.“ Û bi van gotinên xwe jî tinazên xwe bi Çardo dikin. Çardo qet guh nade gotinên wan û ew jî li hespê xwe siwar dibe û dide ser rê. 14 bira dîsa pir diçin hindik diçin, ji çiya û baniyan dibihurin û car din mêrgeke pir xwêse dibînin. 13 bira car din ji hev re dibêjin, „ev mêrg ji bo bêhnvedanê ciyekî pir xweş e.“ Û berî ku bibe şev hespên xwe girê didin û ji bo ku razên her yek li ciyekî xwe dirêj dike. Çardo dîsa ji wan hinekî dûr hespê xwe girê dide. Û dîsa mîna ku radizê dike û çavdêriya derdorê dike. Pir tê de naçe, zuhayê maran dibîne. Marî di ber xwe de dibêje, „Ev fehş kî ye bêdestûr ketiye nav mêrga min.“ Çardo çawa van gotinan dibihîse, bédeng bi alî marî ve diçe û pûlê zêr yê di dûvikê marî de jê dike û dixê çentikê xwe. Mar hema wê gavê li wir di xew re diçe. Çardo jî bi dilekî fireh çavên xwe dimiçîne û di xew re diçe.



Bi vebûna çavên sibê re, 13 birayan şiyar dike û car din didin ser rê. Her 13 bira dîsa bi heman gotinan ji Çardo re dibêjin tirsonek e loma diçe ji wan dûr vêsa xwe dide. Çardo dîsa guh nade wan û dide dû birayên xwe. Dîsa pir diçin hindik diçin. Ji çiya û baniyan dibihurin. Li ciyekî pir dûr şewqekê dibînin.

Die 13 Brüder, die nicht ahnten, was in der Nacht passiert war, brachen nach einem erholsamen Schlaf mit den ersten Sonnenstrahlen auf. Als sie an Çardos Nachtlager vorbei ritten, riefen sie: „Schaut euch diesen Feigling an! Er ist so feige, dass er so weit weg von uns sein Lager aufgeschlagen hat,“ und machten sich über ihn lustig. Doch Çardo ignorierte sie, stieg auf sein Pferd und machte sich auf den Weg. Und wieder ritten und ritten die 14 Brüder, überquerten Berge und durchquerten Täler. Als sie wieder an einer schönen Wiese vorbeikamen, sagten die 13 Brüder zu sich: „Das ist ein sehr schöner Ort zum Rasten.“ Und bevor es Nacht wurde, banden sie ihre Pferde an und legten sich zum Schlafen nieder. Wieder ging Çardo ein Stück weiter und stellte sich schlafend. Schon bald sah er eine riesige Boa. Die Schlange murmelte vor sich hin: „Welche Tölpel haben sich hier ohne Erlaubnis auf meiner Wiese niedergelassen.“ Als Çardo dies hörte, pirschte er sich ganz leise an die Schlange heran und pflückte ihre goldene Schuppe vom Schwanz und steckte sie in seine Tasche. Die Schlange schlief auf der Stelle ein. So konnte auch Çardo, der die Goldschuppe der Boa in seiner Tasche hatte, friedlich schlafen.

Als die ersten Sonnenstrahlen des nächsten Morgens sie weckten, machten sie sich wieder auf den Weg. „Schaut euch diesen Feigling an! Er ist so feige, dass er so weit weg von uns sein Lager aufgeschlagen hat,“ sagten die 13 Brüder und machten sich wieder über Çardo lustig.

13 bira pir kêfxweş dibin. Ji hev re dibêjin, dibe ku ev şewq ya malekê be. Û hespên xwe leztir diajon. Wekî texmîna wan derdikeve. Ev malek e. 13 bira tavilê ji hespên xwe peya dibin û li deriyê malê didin. Du hûtên qambihost derî li wan vedike. Ev hûtên qambihost di esasa xwe de du cinawir in. Ew sêhrê dikin û dilqê xwe diguherînin. Hûtê qambihost yê navê wî Qelemqut e ji jina xwe re dibêje:

„Mêvanên me hene. Em tavilê xwarinê bo wan amade bikin. Çardo û 13 birayên xwe, li wê derê rûdinên û li benda xwarinê dimînin. Lê şik dikeve dilê Çardo. Û bi dizîka guh dide xeberdanên Qelemqut û jina wî. Jina wî dibêje, „Em îsal pir bi şans in. 14 hesp û 14 mirov. Ev hemû têra zivistanê dikin û zêde ne jî.“

Qelemqut ji jina xwe re dibêje, bila giyayê xewê têxe nav xwarîna her 14 birayan. Lê jina Qelemqut hinekî ditirse û dibêje, „Lê ku hin ji wan xwarinê nexwe û şiyar bimîne wê çawa be?“ Qelemqut dibêje, „Meraqan neke. Ger ew ji vê malê sax derkevin ji nikarin ji daristana bî efsûn bibihurin. Ger bibihurin ji wê efsûn wan gêj bike. Ew ancax gava ji gola bî sêhr avê vexwin dikarin xelas bibin.“ Çardo piştî van gotinan dibihîse tavilê diçe birayên xwe hişyar dike.

Doch Çardo ignorierte sie, stieg auf sein Pferd und machte sich auf den Weg. Wieder ritten sie und ritten, überquerten Berge und durchquerten Täler, bis sie ein weit entferntes Licht sahen.

Die 13 Brüder freuten sich sehr, denn sie glaubten, dass dieses Licht zu einem Haus gehören könnte. Und sie ritten schneller und schneller. Ihre Vermutung stellte sich als richtig heraus und sie kamen wirklich zu einem Haus. Sie klopfen an der Tür und zwei Zwergriesen öffneten. Eigentlich war es zwei Monster, die sich durch magische Kleidung verwandelt hatten.

Der Zwergriese namens Qelemkut sagte zu seiner Frau: „Wir haben Gäste. Wir wollen ihnen gleich etwas zu essen machen.“ Çardo und seine 13 Brüder traten ein und warteten auf das Essen, das Qelemkut und seine Frau für sie zubereiten wollten. Aber Çardo wurde misstrauisch. Heimlich lauschte er dem Gespräch von Qelemkut und seiner Frau in der Küche. Qelemkuts Frau sagte: „Wir haben dieses Jahr großes Glück. 14 Pferde und 14 Menschen. Das wird wenigsten 14 Winter für uns reichen.“ Dann befahl Qelemkut seiner Frau, dass sie ein Kraut ins Essen tun sollte, das die 14 Brüder sofort einschlafen lassen würde. Aber Qelemkuts Frau erwiderte etwas ängstlich: „Nur, was passiert, wenn einige nichts vom Essen nehmen und wach bleiben?“ Qelemkut antwortete: „Mach dir keine Sorgen. Selbst wenn sie dieses Haus heil verlassen, werden sie es nicht schaffen den Zauberwald zu durchqueren. Wenn sie versuchen den Wald zu durchqueren, wird der Zauber sie betäuben. Sie können nur überleben, wenn sie vom Wasser des magischen Sees trinken.“





Hinek jê dîsa tinaza xwe pê dîkin, lê Çardo bi zorê be jî wan ji mala hûtan derdixe. 14 birayên ji daristana bi efsûn û ji berwarên bi efsûn dibihurin, berî bigihîjin gola bi sêhr li erdê pîj dibin. Lê Çardo, berî têkevin daristana bi efsûn û berwarên bi efsûn, dev û pozê xwe pihêt girê daye û berî li erdê pîj bibe digihîje golê û hema avê jê vedixwe û tê ser hişê xwe. Çardo, ava golê bi birayên xwe û bi hespan dide xwarin û car din didin ser rê. Ji warekî diçin welatekî. Tê çiyekî û 14 bira li wir bi hespên xwe radiwestin. Li vê derê çardeh rê hene û ew nizanin ka ji kîjan alî de biçin. Di nava xwe de xeber didin. Çardo tavilê xwe dixê navê û dibêje, „Her yek ji wê ji rêyekê biçe. Lê bila her kes gustîla di tiliya xwe de têxe bin kevirê rêya ku wê bide ser. Kî ku vegeheriya bila gustîla xwe ji bin kevir hilde em bizanibin ka kî vegeheriya kî venegeriya.“ Birayên wî gotinên Çardo beraqil qebûl kirine û her yekî ji wan pêşî gustîla xwe xistiye bin kevir û paşê daye ser rê. 14 rêyan 14 bira ji hev kirine. Çardo jî her wekî birayên xwe yên din daye ser rêyekê. Pir zêde rê çûye û serayeke mezin dîtîye. Çardo çûye serayê û xwe li wir daye nasîn. Gotiye, ew kurê qralê ye, 13 birayên wî hene û li malbateke 14 keçikên wê hene digere. Û ji wan re gotiye sedema lêgerîna wî ji bo zewicîna bi wan keçikan re ye. Qralê wî welatî gotinên Çardo guhdarî kirine û ji nişkê ve pir kêfxweş bûye. Tavilê ji bo Çardo sifre hatiye danîn, bezm û şahî hatiye kirin. Ji ber ku 14 keçikên vî qralî hebûne. Û qral jî li qraliyeke bi 14 kuran geriyaye da keçikên xwe bidîye. Qral, zaveyên xwe yên li esmanan digeriya lê li erdê ditiye, ji Çardo re gotiye, „Ez ê keçikên xwe wekî jin bidim birayên te û yekê jî li te mehr bikim. Lê şertekî min heye.“

Çardo şertê wî ji qral pirsîye. Qral Çardo bîriye menzelekê. Dîtiye li menzelê jinek raketî ye. Qral jinik nîşanî wî daye û gotiye, „Tu vê jinikê dibînî? Ev jina min a delal e. bi salan e wiha wekî miriyan radikeve.

Als Çardo dies hörte, warnte er sofort seine Brüder. Auch wenn sich einige von ihnen wieder über Çardo lustig machten, folgten sie ihm aus dem Haus.

Die Brüder, die daraufhin den Zauberwald durchquerten, wurden ohnmächtig, ehe sie an den magischen See gelangten. Doch bevor Çardo den Zauberwald betreten hatte, hatte er sich Mund und Nase so fest zugebunden, dass er den See erreichte, ohne wie seine anderen Brüder in Ohnmacht gefallen zu sein. Nachdem er vom Wasser des magischen Sees getrunken hatte, wurden seine Sinne wieder ganz klar. Çardo gab sofort seinen Brüdern und deren Pferden von dem Wasser und dann setzten sie ihren Weg fort und gelangten in eine ganz andere Gegend.

Sie kamen an eine Kreuzung, von der 14 Wege abgingen und die Brüder wussten nicht, wohin sie gehen sollten. Sie fingen an, sich zu beratschlagen, doch Çardo warf sofort ein: „Jeder von uns wird einen der Wege gehen. Vorher legt jeder seinen Ring unter den Stein, der am Anfang des Weges liegt, den er genommen hat. Wer zurückkehrt, nimmt dann wieder seinen Ring an sich. Dann wissen wir, wer zurückgekehrt ist und wer nicht.“

Seine Brüder stimmten seinem Vorschlag zu und jeder von ihnen brach in eine andere Richtung auf. Auch Çardo folgte, genau wie seine Brüder, einem der Wege. Und er folgte dem Weg so lange bis er zu einem großen Palast kam. Er betrat den Palast und wurde vorstellig. Er erzählte, dass er der Sohn eines Königs sei und dass er 13 Brüder habe und er eine Familie mit 14 Töchtern suche. Er erzählte eins nach dem anderen. Als der König jenes Landes hörte, was Çardo zu sagen hatte, freute er sich sehr. Er ließ sofort den Tisch für Çardo decken und rief zum Fest. Denn dieser König hatte 14 Töchter und auch er suchte ein Königreich mit 14 Söhnen. Auch er hatte überall nach 14 Bräutigamen für seine Töchter gesucht und sprach zu Çardo: „Ich werde deine Brüder und dich mit meinen Töchter verheiraten, allerdings nur unter einer Bedingung.“ Als Çardo nach der Bedingung fragte, brachte der König Çardo in ein Zimmer und zeigte auf eine Frau, die dort in einem Bett lag. „Siehst du die Frau dort liegen? Das ist meine liebe Frau. Sie schläft seit Jahren wie eine Tote. Eine Hexe hat sie verzaubert. Und nur die Halskette der Frau eines Monsters namens Qelemqut aus einem fernen Land kann meine Frau heilen. Eine Hexe hat die Seele meiner Frau in dieser Halskette versteckt.“

Als Çardo das hörte, sagte er: „Ich werde dir die Halskette bringen. Wenn ich die Halskette gebracht habe, werde ich deine Töchter nehmen und in mein Königreich bringen.“ Der König willigte ein und Çardo machte sich auf den Weg zum Haus von Qelemqut.



Sêhrbazekî sêhr lê çêkir. Û tenê gerdeniyek dikare jina min baş bike. Ew gerdenî bi stûyê jina hûtekî bi navê Qelemqut ve ye. Ji ber ku sêhrbaz ruhê jina min di nava wê gerdeniyê de vedişêre. Çardo li ser van gotinan dibêje, „Ez ê wê gerdeniyê bînim ji wer e. Gava min anî jî, ez ê keçikên we hildim û bi xwe re bibim qraliya xwe. Qral soz û bext didiyê. Û Çardo berê xwe dide mala Qelemqut ya berê bi saxî jê filitibû.

Çardo durchstreifte den verzauberten Wald und kam am magischen See vorbei und klopfte schließlich ganz seelenruhig an Qelemquts Tür. Der Zwergriese öffnete und griff Çardo sofort an. Doch Çardo wehrte sich gar nicht. Daraufhin fragte Qelemqut: „Warum bist du wieder hierher gekommen?“ Çardo antwortete: „Ich habe dir Unrecht getan. Ich bin zurückgekommen, um meinen Fehler wieder gut zu machen.

Çardo, jixwe daristana bi efsûn û gola bi sêhr dizane û bi dilekî rihet diçe li deriyê Qelemqut dide. Cinawirên xwe xistine hûtên qambihost, hema bi dîtina wî re êrîşî wî dikin. Çardo jî qet dengê xwe nake. Qelemqut jê re dibêje, „Tu çima car din hati vê derê?“ Çardo dibêje, „Min şaşîti li we kir. Ji bo ku şaşîtiya xwe ji navê hildim, vegeyriyam hatim. Hûn dikarin vê zivistanê bi noşî can min bixwin.“ Qelemqut dibêje, „Ez ê te nehêlim ji zivistanê re, ez ê li ber çavê hemû cinawiran te têxim mencelê û bikelînim.“ Û Çardo li derve bi darekê ve girê dide. Ji jina xwe re jî dibêje, „Tu jî ji bo agirê sibê êzingan amade bike ez jî herim haziriyên din bikim.“ Ji ber ku jina Qelemqut pîr e xweşikî nikare bivirê bi kar bîne. Çardo gava dibîne ew nikare bi bivirê daran bibire, tinaza xwe pê dike. Dibêje, „Tu jina Qelemqut î lê hê nizanî ka tu yê çawa êzingan hazir bikî.“ Li ser gotina wî, jina Qelemqut dibêje wî, „Hemin ku tu pir dizanî ka were tu daran bibire.“ Û benê Çardo ji hev vedike. Çardo pêşî çend daran dibire û paşê ji nişkê ve jina Qelemqut digire û bi darê ve girê dide. Û gerdeniya bi stûyê wê ve jê derdixîne.

Du kannst mich diesen Winter in aller Ruhe verspeisen.“ „Ich werde dich nicht für den Winter aufheben. Morgen werde ich dich vor den Augen aller Monster in den Kessel werfen,“ sagte er und fesselte Çardo an einen Baum. Zu seiner Frau sagte er: „Bereite für morgen viel Holz für das Feuer vor. Ich werde die anderen Vorbereitungen treffen.“ Seine Frau war schon alt und nicht mehr besonders geschickt mit der Axt. Als Çardo das sah, machte er sich über sie lustig. Er sagte zu ihr: „Du bist Qelemquts Frau, aber du weißt nicht, wie man Holz hackt.“ Qelemquts Frau entgegnete wütend: „Wenn du es besser kannst, dann mach du es doch.“ Und sie band Çardo los. Çardo hakte zuerst ein paar Holzstücke und dann fesselte er Qelemquts Frau an den Baum. Jetzt konnte er in aller Ruhe ihre Halskette an sich nehmen. Als Qelemqut zurückkam, war Çardo mit seinem Pferd längst über alle Berge. Daraufhin brachte Çardo dem König die Halskette und sah mit eigenen Augen wie die Frau des Königs erwachte.

Der König war überglücklich und verlobte seine erstgeborene Tochter mit Çardo. Er schickte sie zusammen mit seinen 13 anderen Töchtern in Çardos Land, um dessen Brüder zu heiraten. Auf dem Rückweg kamen Çardo und die 14 Schwestern wieder an die Kreuzung mit den 14 Wegen. Çardo stieg ab und schaute unter jeden Stein. Bald wurde ihm klar, dass keiner seiner Brüder zurückgekehrt war.



Berî Qelemqut were li hespê xwe siwar dibe û ji wir dūr diçe. Çardo gerdenî dide qral û dibîne jina qral çawa şiyar dibe. Ji kêfan bask bi qral ve çêdibin. Û keça xwe ya nûxirî bi Çardo re destgirtî dike. Û 13 keçên xwe jî ji bo ku bi birayên Çardo re bizewicin, bi Çardo re dişîne welatê wan. Bi rê de, Çardo û 14 xwişk tên ser 14 rêyan. Çardo ji hespê xwe peya dibe û li bin keviran dinêre. Û fam dike tu birayekî wî venegeriyaye. Çardo 14 xwişkan li ciyekî ewledar dihêle û ji bo birayên xwe bibîne dide ser rê. Di her rêyê de dibîne her yek birayekî wî an wekî pale an jî wekî xulam dixebite.

Yek bi yek birayên xwe li hev dicivîne, gustîlên wan dide wan û ji wan re dibêje wî 14 xwişk peyde kirine. Lê nizane hê wê çî were serê wî. 14 xwişk bi 14 birayan re didin ser rê. Pir diçin hindik diçin. Ji çiya û baniyan dibihurin. Pir hindik rê dimîne ji bo bigihîjin malê. 13 bira tên ba hev û dest bi xeberdana di nava hev de dikin. Ji bo nîşanî bavê xwe bidin wan bi xwe ev huner kiriye, kemîn bo Çardo datînin. 13 bira bi rê de bîrek vedidin, devê bîrê bi devîyan digirin û berê Çardo didin wî alî. Çardo gava bi rê de diçe, dikeve nav bîrê. Û çî qas deng û gazî li birayên xwe bike jî yek jê jî alîkariya wî nake. 13 bira 14 xwişkan didin tengala xwe û berê xwe didin serayê. Mîna ku wan bi xwe her tişt kiribin ji bavê xwe re dibêjin. Bavê wan dibêje, „hûn 13 bira ne lê 14 xwişk hene.“ Bira bi yekdevî dibêjin, „Bi salan e dêya me miriye. Me ji bo te jî jinek peyde kir. Bavê wan, qral pir kêfxweş dibe. Kurên wî lê fikirîne û di dilê xwe de dibêje, „êdî zarokên min mezin bûn û dikarin qralîya min bi rê ve bibin. Û tavilê ji bo şahî û dawetan fermanê dide. Lê belê prensesa bi Çardo re destgirtî dipirse ka ev şahî û dawet ji bo kê ye. Yek ji xizmetkarên serayê dibêje, „Ev daweta te û ya qralê me ye.“ Prensese digirî û dibêje, „Lê belê ez destgirtiya Çardo me. Wî, ez ji bavê min ê qral, ji bo xwe xwestim, ne ji bo qral.“ Li ser vê yekê destgirtiya Çardo, xwişkên xwe jî dide cem xwe û diçe hafa qral.

Qral bi çavên tîr meraq difikire ka ew ê prensesa wê pê re bizewice çî bêje jê re. Û dibêje, „Prensese ciwan, fermo.“ Destgirtiya Çardo dibêje, „Cenabê Qral. Ez dibêjim qey tiştêkî ne rast heye di vî îşî de. Van 13 birayan em ji bavê me nexwestin. Çardo em anîn. Tenê Çardo şertê bavê min bi cî anî. Heta roja îro jî tu kesî newêribû here gerdeniya di stûyê jina Qelemqut de derxîne û bîne. Tenê Çardo karibû. Û bavê min jî ez bi Çardo re destgirtî kirim. Çawa çêdibe hûn dikarin bi min re bizewicin, ez destgirtiyê kurê we me.“

Also ließ Çardo die 14 Schwestern an einem sicheren Ort zurück und machte sich auf die Suche nach seinen Brüdern. Egal wohin ging, er sah, wie seine Brüder entweder auf dem Feld oder auf dem Bau für andere arbeiteten.

Als Çardo alle seine 13 Brüder gefunden hatte, gab er ihnen ihre Ringe zurück und erzählte ihnen, dass er 14 Schwestern gefunden hatte. So machten sich die 14 Schwestern und die 14 Brüder gemeinsam auf den Weg zurück in ihr Königreich. Sie ritten und ritten, durchquerten Berge und durchquerten Täler. Doch kurz bevor sie nach Hause kamen, versammelten sich die 13 Brüder und teilten ihren Unmut. „Wenn der König von Çardos Heldentum erfährt, wird er uns aus dem Palast vertreiben,“ dachten sie und sie versuchten eine Lösung zu finden. Um ihrem Vater vorzuspielen, dass sie alle Heldentaten selbst vollbracht hätten, stellten sie Çardo eine Falle. Sie gruben eine Grube, bedeckten sie mit Laub und lockten ihren Bruder dorthin. Als Çardo hineinstürzte, reagierten sie nicht, wie sehr er auch nach seinen Brüdern rief. Dann kehrten die 13 Brüder zusammen mit den 14 Schwestern in den Palast zurück. Sie erzählten dem König alles so, als hätten sie alle Heldentaten selbst vollbracht. Daraufhin sprach der König: „Ihr seid 13 Brüder, aber hier sind 14 Schwestern.“ Und die Brüder antworteten: „Unsere Mutter ist schon vor vielen Jahren gestorben, deswegen haben wir eine Frau für dich gefunden.“ Der König freute sich sehr und dachte bei sich, dass seine Kinder nun auch das Königreich regieren könnten, wenn sie auch an ihren alten Vater dachten. So wurde sofort mit den Hochzeitsvorbereitungen begonnen. Aber die Prinzessin, die mit Çardo verlobt war, wurde misstrauisch und fragte: „Wessen Hochzeit soll das werden?“. „Das wird deine Hochzeit und die Hochzeit unseres Königs“, antwortete einer der Palastbeamten. „Aber ich bin die Verlobte Çardos. Er hat bei meinem Vater, dem König, um meine Hand angehalten, für sich selbst und nicht für seinen Vater,“ sagte sie und begann zu weinen. Also trat sie zusammen mit ihren Schwestern vor den König.

Der König wunderte sich, was ihm die junge Prinzessin, die er heiraten wollte, zu sagen hatte. Çardos Verlobte sprach: „Mein lieber König, ich glaube, da stimmt etwas nicht. Es waren nicht diese 13 Brüder, die uns von unserem Vater wollten. Çardo war es. Denn Çardo war der Einzige, der die Bedingung des Königs erfüllen konnte. Niemand sonst hatte es gewagt, die verzauberte Halskette von Qelemquts Frau zurückzuholen. Nur Çardo hat diese Heldentat vollbracht und mein Vater hat mich mit Çardo verlobt.“



Qral piştî van gotinan bihîstiye, ji ber heyirînê nizanibûye çî bêje. Tavilê xeber şandiye jina xwe ya pêşî, dêya Çardo. Pirsî Çardo jê kiriye. Dêya Çardo gotiye, „Kurê min hê venegeriyaye malê. Li ser vê yekê qral gazî 13 kurên xwe kirine. 13 bira mecbûr mane jê re bêjin, wan kemîn li Çardo danîne û ew di nav birê de ye. Qral zilamên xwe şandine û Çardo ji birê daye derxistin. Pêşî daweteye pir xweş ji bo Çardo daniye. Çil roj û çil şev şahî hatiye kirin.

Wie wollt ihr die Verlobte eures Sohnes heiraten?“ sagte sie. Der König war so überrascht, dass er gar nicht wusste, was er antworten sollte. Sofort ließ er Çardos Mutter rufen, die erste Frau des Königs, und fragte sie nach Çardo. Sie sagte: „Mein Sohn ist noch nicht nach Hause gekommen.“ Daraufhin rief der König seine 13 Söhne zu sich. Nun mussten die 13 Brüder dem König von der Falle erzählen, die sie ihm gestellt hatten, und der Grube, in die Çardo gefallen war. Sofort schickte der König seine Männer und ließ Çardo befreien.



Ji ber neheqiyên lê kiriye, efûya xwe ji jina xwe ya pêşî xwestiye û ji bo car din vegere serayê û pê re bijî, jê xwestiye car din bibe jina wî. Û Qral, bi Çardo û 13 kurên xwe yên din, jîyaneke xweş qedandiye.

Çardo feierte eine wundervolle Hochzeit. Die Hochzeit dauerte 40 Tage und 40 Nächte. Und der König entschuldigte sich bei seiner ersten Frau und machte ihr einen neuen Heiratsantrag. Der König lebte zusammen mit seiner Frau, Çardo und seinen 13 Söhnen ein glückliches Leben. Und wenn sie nicht gestorben sind, dann leben sie noch heute.

KEÇEKE KURD, "KAFE SORAN" Û BAJARÊ SILÊMANÎ

DAS KURDISCHE MÄDCHEN CAFÉ SORAN UND DIE STADT SULEYMANIYAH

Vebêjer: Şîrê Elîda HAN

Erzähler: Şîrê Elîda HAN



Li bajarekî Almanyaya bavekî û keça xwe li parkê digerîyan.

Li nêzikî parkê jî cîhekî xwerin û vexwerina tiştê teze hatibu vekirin. Li ber dikanê jî qesasirên bi her çeşîdî dihate firotan. Zarokên biçuk û bi tevî dê û bavên xwe li ber dikanê kom dibûn û her kes li benda dora xwe bû, ku qeşaşîrên xwe bigrin û bixwin. Hinekan jî wan bi almanî û hinekan jî bi tirkî daxweza xwe dikirin û dikançê jî ew dibersivandin.

Dor hatibu keça Kurd û bavê wê.

Bav ji keça xwe pirsî: "keça min kîjanî hez dikî, ji kekê dikançê bixweze."

Keçikê got, "Xalo ji min re yek hêşîn û yek jî qehweyî bide."

Dikançê serê xwe rakir û bi rûyekî ken ji wê pirsî: "Eferim gîyan, to Kurdî?"

Keçik got, "Belê ez Keça Kurdistan im."

Dikançê bêhtir kêfxweş bû, berî ku qeşaşîrawê bide, destê xwe direjkir û got:

"Min îs Kurd im, nawim Mehmûd e."

Keçikê jî got: "Navê min jî Şîrê ye."

Dikançê gelek dilsad bûbû, jiber ku wê rojê yekem car (belkî jî gellek rojan) zarokeke pênc salî yekser bi Kurdî jê tistekî xwestibu.

Li ser vê yekê dikançê hinekî suhbet kirin. Suhbeteke xweş çêbû. Di vê navberê de dikançê û bavê keçê behsa zaravên Kurdî dikirin, Kirmançkî, Kurmancî, Soranî filan û bêvan, Keçik jî hem guhdarîya wan dikir û hemjî qeşaşîra xwe ya şîr û qehweyî dixwer. Piştî lezeke kin zarok eciz bûbû û yek ser ji wan re got:

"Bavo, xalo ev çî ye hûn dibêjin Soranî, Kirmançkî, Kurmancî... Mêze bikin, ez qet tistekî wisa dibêjim? Ez keça Kurdistan im û tamam. Pirsgirêk çî ye?"

Herdu "mezinên" Kurd matmayî man.

Bav keça xwe maç kir û dilê wî tijî bû, bi salan in rewsenbîr û siyasetvanên Kurd ev pirsgirêk hel nekirin û a nîha jî warên Kurdistanê li gor vê nihêrîne xweliserî parce parce ye. Lê keçeke pênc salî ev mijar bi du hevokê hel kiribu:

"Ez keça Kurdistan im."

Eines Tages in einer Stadt in Deutschland ging ein Vater mit seiner Tochter im Park spazieren.

In der Nähe des Parks hatte ein kleiner Kiosk eröffnet, der Eis sämtlicher Sorten verkaufte. Vor dem Laden hatte sich schon eine Traube von Eltern mit ihren Kindern gebildet, die alle darauf warteten ein Eis zu kaufen und es zu essen. Manche bestellten auf Deutsch, andere auf Türkisch. Der Eisverkäufer erfüllte ihnen ihre Wünsche auf in beiden Sprachen.

Nun war die Reihe an dem kurdischen Mädchen und ihrem Vater angelangt und der Vater fragte seine Tochter: „Was hättest du gern? Sag es dem Ladenbesitzer.“ Das Mädchen antwortete: „Onkel, gib mir eine Kugel von dem grünen Eis und eine von dem braunen.“

Da hob der Ladenbesitzer den Kopf, lächelte und fragte sie: „Sehr gut! Sag, bist du Kurdin?“

Das Mädchen antwortete: „Ja, ich bin ein kurdisches Mädchen.“

Der Ladenbesitzer freute sich sehr darüber und bevor er dem Mädchen ihr Eis reichte, streckte er seine Hand aus und sagte: „Ich bin auch Kurde. Mein Name ist Mahmut.“

„Ich bin Şîrê“, entgegnete das Mädchen.

Der Ladenbesitzer freute sich so sehr, weil zum ersten Mal ein fünfjähriges Kind ihn etwas auf Kurdisch gefragt hatte. Dann unterhielten sie sich ein wenig miteinander. Es war eine nette Unterhaltung, bei der das Gespräch zwischen dem Vater und dem Ladenbesitzer auf die kurdischen Dialekte kam. Zazaki, Kurmandschi, Sorani usw. Während das Mädchen sein Eis aß, hörte es dem Gespräch zu, langweilte sich aber schnell und fragte plötzlich: „Was redet ihr denn da? Zazaki, Kurmandschi, Sorani, ...Das ist doch ganz einfach. Ich bin ein kurdisches Mädchen. Da gibt es doch gar kein Problem.“

Die beiden Männer waren sehr überrascht und der Vater des Mädchens war so gerührt, dass er ihr einen Kuss auf die Wange gab. Dieses Problem, das die kurdischen Intellektuellen und Politiker seit Jahren nicht lösen konnten, hatte Kurdistan zerrüttet und jetzt hatte ein fünfjähriges Mädchen es in zwei Sätzen gelöst.

„Ich bin ein kurdisches Mädchen.“

Das Interessante war, dass das Mädchen verstand, was zwei Menschen aus Süd- oder Nordkurdistan sagten, oder wenn sie gar Dialekt redeten. Für ein Kind, das die Sprache fließend beherrscht, stellt das nie ein Problem dar.



Ya balkês jî ev bû; keçik axiftina du kesên Basûrî û Bakûrî têgijîstibû; yanê yek ziman hebû û bi zarav dema hatiba axaftin jî, jî bo zarokek ku zimanê xwe bas dizane qet pirsgirêk tunebû.

Gava bav û keçika wî jî dikanê derketin û diçûn, keç jî bavê xwe re wisa got: "Bavo, em dikarin carek din werin Kafe Soran?"

Bav mêze tabeleya dikanê kir û paşê jî keça xwe re got; "Belê keça min em dikarin her hefte carek yan du caran bîn Kafe Soran. Xalê Mehmûd jî kesek hêja ye û gelek jî te hez kir."

Keçik jî dikançê re got;

Xatirê te xalê Mehmûd, xatirê te Kafe Soran."


Bav pir xemgîn bû lê dîyar nekir, jiber ku navê kafe "Kafe Mimoza" bû.

Lê saya keçeke Kurd ya pênc salî, a niha xwediyên wê dikanê jî tê de li wê taxê piranî nistecîh jî wê re dibêjin "Kafe Soran"

Als der Vater und seine Tochter den Laden verließen, fragte das Mädchen seinem Vater: „Kommen wir bald wieder ins Café Soran?“

Der Vater schaute auf das Ladenschild und sagte dann zu seiner Tochter: „Ja, wir kommen bald wieder ins Café Soran, bestimmt jede Woche ein oder zwei Mal. Onkel Mahmut ist ein guter Mensch und er mag dich sehr.“ Dann sagte das Mädchen zum Ladenbesitzer: „Tschüss Onkel Mahmut, Tschüss Café Soran!“

Der Vater war sehr traurig, aber zeigte es seiner Tochter nicht. Denn der Name des Cafés war nicht „Café Soran“, wie der Name der kurdischen Sprache, sondern einfach nur „Café Mimose“. Aber dank des fünfjährigen kurdischen Mädchens nannten es nun alle, auch der Besitzer selbst, „Café Soran“.



KEYSERÎNA BI SEBIR Û ŞAXA DARA SÊVÊ

*DIE GEDULDIGE KAISERIN UND
DER SPROSS DES APFELBAUMS*

Vebêjer: Elmas HAN

Erzähler: Elmas HAN

Hebû tunebu, di dema xwe de li welatê
Kurdîstanê devereke pir xweşik hebû û xelkê
wê devere jiyaneke xweş û dilşad dijîyan.

Es war einmal vor langer, langer Zeit im Land
Kurdistan, in einer schönen Gegend, in der die
Menschen ein sehr glückliches Leben führten.



Keyserekî pir baqil û dilsoz hebû. Jîna wî, yanê Keyserîna wî welatî gelek bi sebir û dilşewat bû. Ji mirovên wî welatî kî biçûya cem û derdekî xwe jê re bigota, Keyserîna û Keyserî yeqîn jê re çareyek diditin.

Îcar derdekî wan jî hebû;

Keyser ji jîna xwe pir hez dikir lê zarokên wan çenedibû. Wî ji zarokan pir hez dikir, ji ber vê jî dixwest zarokek wan hebe. Yek jî ji bo ku bi dû wî re kesek bibê keyser diviyabû zarokek wan hebûya. Ji ber vê yekê Keyser pir xemgîn bû, her rojên wî bi xemgînî derbas dibû, lê ji destê kesî çî tiştek nedihat ku alîkarîya wî bikin.

Rojekê bijîşkek hatîye wî welatî û mêze kiriye her kes behsa nexweşîya Keyserî dike, çûye ji xwediyê xana ku ew dimîne pirs kiriye:

Yaw çî tiştî Keyserê we heye?
Xwediyê Xanê gotiye;

Qet pirs nekin hekîmê min, Keyserê me yekî pir baş e, pir dilşewat e, pir dilsoz e, lê zarokek wî tune ye û ji ber vê ew pir xemgîn e û ji ber xemê nexweş ketiye.

Hekîm rabûye çûye seraya Keyserî; li ber derî nobedar hebûne, ji wan re gotiye;

Ka rê bidine min ez dê biçim cem Keyserî û derdê wî derman bikim.
Nobedar çune hundir û piştî demeke kin hatine û bijîşk birine hizûra Keyserî.

Keyser pirsîye;

Ka bêje bira, tu dê çawa ji derdê min re derman bibînî? Ca bêje ji kerema xwe re.

Bijîşkî gotiye;

Keyserê min yê hêja û ezîz, ev tovên sêva bi sêhr in, pir bi hêz in, ji kerema xwe re emir bide mirovên xwe bila van tovan hemû li baxçê serayê bireşînin. Piştî demekê baxçeyê we dê tijî darên sêvan bin, bila gelê we jî bîn û ew ji xwe re jê fayde bibînin û hûn bi xwe jî sêva wan daran bixwin. Hûn dê di demeke kin de bibin xwedî zarokên xweşik.

Hemin Keyserî zêde pêbawerî nekiriye, ji ber ku ew pir bêhêvî bûye. Lê dîsa jî gotiye "Ez biceribînim, ma çî zirarê wê hebe." Ez pir bêhêvî me bijîşk bira lê dîsa jî ez dê gotina te bikim, eger pêk hat û zarokek min çêbu, tu çî bixwazî ji min ez dê bi cih bînim.

Es gab dort einen Kaiser, der sehr klug war und zu seinem Wort stand. Die Frau des Kaisers, die Kaiserin des Landes, war eine sehr geduldige und barmherzige Frau. Egal, wer im Land mit ihnen seine Sorgen teilte, immer fanden die Kaiserin und der Kaiser eine Lösung.

Doch auch der Kaiser und die Kaiserin hatten ein Problem: Der Kaiser liebte seine Frau sehr, aber sie bekamen einfach keine Kinder, obwohl sie Kinder sehr mochten. Deshalb wünschten sie sich so sehr ein Kind. Außerdem wünschte sich der Kaiser natürlich einen Nachkommen, dem er eines Tages das Reich überlassen konnte. Das machte den Kaiser sehr traurig, doch niemand konnte eine Lösung für das Problem des Kaisers finden.

Eines Tages kam ein Arzt ins Land und auch er hörte, dass alle über die Krankheit des Kaisers redeten. So fragte er den Wirt, bei dem er zu Gast war: „Was sind die Sorgen eures Kaisers?“

Der Wirt antwortete: „Mein lieber Arzt, das ist eine gute Frage. Unser Kaiser ist ein sehr guter Mann. Er ist sehr barmherzig und er steht zu seinem Wort, aber er hat keine Kinder. Deswegen ist er sehr traurig und verlässt sein Gemach nicht mehr.“





Bijîşk gotiye:

Keyserê min yê ezîz, hûn Keyserekî pir dilsoz in û her kes ji we memnûn e, hûn baş bibin û derdê we derman bibe besî min e.

Li ser vê yekê Keyser emir daye û hemî mirovên wî belav bûne û dest bi kar kirine û gelek tov reşandine. Lê gelek dem derbas bûye, tiştek tune ye, ne dar şîn dibin û ne jî sêv didin.

Piştî demekê Keyser bi hêrs bûye û hemû baxçe ser û bin kiriye, ew darên biçûk û şitlên teze şînbûyî ji pê re qetandine. Lê bes şitlek ji wan ji aliyê jina Keyserî hatiye rizgarkirin. Keyserîna bi sebir ew şitl veşartîye.

Keyserîn jineke pir baqil û bi sebir bûye, ew fikiriye ku Keyser ji ber ku bêsebir e Xwedê dar şîn nekiriye, ji ber vê yekê ew şitla biçûk biriye û li goşeyekê çandîye. Her roj av daye, pir xweş lê nihêriye, dewr û berê wê temîz kiriye û piştî demeke mêze kiriye ku şitil şîn bûye. Dareke xweşik şîn bûyê û paşê sêvên xweş jê derketine. Pir şa bûye û çûye ji Keyserî re gotiye, ku bila yek ji wan sêvan bixwe.

Her ci qas Keyser nexwestîye bixwe jî, jina wî ya delal, xweşik û bi sebir, lava kiriye û paşê Keyserî jî dest pê kiriye, ji wan sêvan xwariye. Êdî Keyserîna delal her roj sêvek daye mîrê xwe û pê daye xwarin. Piştî neh meh û deh rojan Xwedê zarokek daye wan.


Also ging der Arzt zum Palast des Kaisers und sagte zu den Wachen am Tor: „Lasst mich rein. Ich will zum Kaiser gehen und ihn von seinem Trübsal befreien.“ Die Wachen gingen hinein, kehrten jedoch nach einer Weile zurück und brachten den Arzt zum Kaiser.

„Sag mir, mein Bruder, wie wollen Sie mich von meinem Trübsal befreien?“, fragte der Kaiser.

Und der Arzt antwortete: „Mein verehrter Kaiser, diese Apfelkerne sind magisch. Sie verfügen über eine große Kraft. Gebt Euren Männern den Befehl, diese Samen im ganzen Palastgarten zu verstreuen. Nach einer Weile werden viele Apfelbäume in Eurem Garten wachsen. Ruft dann Euer Volk zu Euch und lasst sie von den Äpfeln essen, genauso, wie Ihr selbst von den Äpfeln essen sollt habt. Schon bald darauf werdet ihr zauberhafte Kinder haben.“

Auch wenn der Kaiser nicht daran glaubte, dachte er bei sich, dass er nichts zu verlieren hätte und sagte hoffnungsvoll zum Arzt: „Mein Arzt, ich bin voller Hoffnung und ich werde tun, was Sie mir geraten haben. Wenn sich Ihre Prophezeiung als richtig erweisen und ich wirklich ein Kind bekommen werde, dann werden Sie mir sagen, was Sie sich wünschen, und ich werde Ihnen diesen Wunsch erfüllen.“





Ji ber ku zarokê wan çêbûye, Keyserê wî welatî pir dilşad bûye û ji ber vê jî li hemû welatê xwe emir daye ku her kes darên sêvan biçînin. Ji ber vê yekê jî li Kurdistanê sêv û meyveyên din pir zêde bûne.

Lê Keyser emirêkî din jî daye; gotiye ji vê şûn de di her malan de gotina jinan jî dê were kirin, daxwazên wan jî bihête kirin û eger mêr û jinekê qise kir, her du jî qasî hev qise bikin. Gotina jina malê eger bihête guhdarîkirin, wê çaxê hem li wî malê û hem jî li hemû welatî dê adanî û zengînî xwe bide diyarkirin.

Ji wê rojê şûn de Keyser êdî hemû biryarên xwe bi tevî Keyserîna xwe girtiye û li wî welatî hem adanî peyda bûye û hem jî jîyaneke xweş ya milletê wî pêk hatiye.

Und der Arzt antwortete: „Mein lieber Kaiser, Ihr seid ein sehr ehrlicher Mensch und Volk schätzt Euch sehr. Mir ist es mehr als genug, wenn Ihr gesund werdet und ich Euch von euren Leid erlösen konnte.“

Daraufhin erteilte der Kaiser den Befehl, dass all seine Männer überall im Garten Apfelkerne verstreuen sollten. Obwohl viel Zeit verging, passierte nichts. Weder trieben die Bäume aus, noch trugen sie Früchte. Nach einer Weile wurde der Kaiser wütend und zerstörte den Garten und riss selbst die wenigen kleinen gekeimten Sprösslinge heraus. Allerdings rettete die Frau des Kaisers eines der kleinen Bäumchen und pflanzte es an einen geheimen Ort.

Die Kaiserin war eine geduldige und weise Frau. Sie dachte, dass Gott die Samen nicht keimen ließ, weil der Kaiser so ungeduldig war. Also nahm sie den kleinen Sprössling und versteckte ihn in einer Ecke des Gartens. Sie gab diesem Baum jeden Tag Wasser und nach einer Weile sah sie den Baum wachsen. Es wurde ein schöner Baum, der wunderschöne Äpfel trug. Die Kaiserin freute sich sehr darüber und bat den Kaiser einen Apfel von diesem Baum zu essen. Obwohl der Kaiser die Äpfel nicht essen wollte, bestand seine geduldige und schöne Frau darauf und so aß der Kaiser den Apfel. Das machte sie von nun an jeden Tag. Und neun Monate und zehn Tage später gebar sie ein Kind.

Der Kaiser war überglücklich, ein Kind zu haben und befahl daraufhin, dass überall in seinem Land Apfelbäume gepflanzt werden sollten. Aus diesem Grund gibt es in Kurdistan viel mehr Apfelbäume als andere Obstbäume.

Aber der Kaiser erteilte auch noch einen anderen Befehl. Von diesem Tag an sollten die Frauen in jedem Haus gehört und ihre Wünsche erfüllt werden. Es sollte nicht nur dem Mann zugehört werden, sondern auch der Frau. Denn, wenn man der Frau des Hauses zuhörte, dann würde sowohl im Haus als auch im ganzen Land Wohlstand und Zufriedenheit herrschen.

Von diesem Tag an traf der Kaiser all seine Entscheidungen zusammen mit seiner Frau und ihr Reich blühte auf und das Volk lebte ein angenehmes und gutes Leben.

DESTANA

KERR Û KULIK

DAS EPOS VON KERR UND KULIK

Vebêjer: Egit Rûmet Arslanargun û Yeko Ardil

“Gava te ez birim û danîm ser çardarê, milên min rast û çep pê ve berde. Bila paş û pêş bihejin û li ba bibin. Kî pirs kir û got gelo çima?: Bêje dinya wiha hatiye û wiha diçe.”

“He wi wi, he wi wi, he wi wi..
Emer Axa xêrê bike qet nebîne, dergûşa kurîn li ber hembêza xwe nebîne,
Genimê bichîne zîwanê dewsê hilîne,
Çawa dike xwarziyan bi ser xalan de bişîne,
şerê xwarzî û xalan giran e, mîna derdekî bêderman e, he wi wii..
şêrên min nezan in, ne biliyan in he wî wî..
Ev destana ku yek ji qehreman“ ên zarokatî û ciwaniya min e. Wiha bi deng û qêrîna Werdekê dest pê dike.

Yekem car min ev destan ji devê jinan yên di nav malbata xwe de bihîstibû. Ji me re gelek kilam, çêrok û destanan digotin. Piştî jî di radyoya Êrîvanê de weke şano dihat lîstin û me jî bi kêfxweşî lê guhdarî dikir. Qonaxa sêyemîn a vê destanê ya di jiyana min de jî pirtûka wê ya ji aliyê nivîskar Ahmet Aras ve hatiye nivîsandin e.

Erzähler: Egit Rûmet Arslanargun und Yeko Ardil

„Wenn ich tot bin, legt mich in einen Sarg und lasst meine Arme auf beiden Seiten heraushängen. Sie sollen ruhig baumeln. Und wenn jemand fragt warum, dann sagt: So ist er auf die Welt gekommen und so geht er auch.“

Ah ah aaah, ah ah aaah, ...
Gutes tun soll Emer Agha
Nicht ihm Gutes getan werden
Ein Sohn möge ihm nicht zuteil werden
Er soll Weizen anbauen und Unkraut ernten
Wie kann man die Neffen gegen den Onkel aufhetzen
Der Krieg zwischen ihnen ist hart
Wie unheilbares Leiden.
Ah ah aahh ...
Die Löwen sind unwissend, sie sind noch klein
Ah ah aahh ...

Dieses Epos, mit den Helden meiner Kindheit und Jugend, beginnt mit Werdeks Geschrei. Ich habe dieses Epos zum ersten Mal von den Frauen der Familie gehört. Sie haben es für uns gesungen und uns Kilam, also Geschichten, Epen und Märchen erzählt.

Ango weke nivîs di salên 1987 an de ew bi destê min ket û di heman salê de şansê min ê dîtina nivîskari jî çêbû.

Qonaxa çaremîn jî îsal e anga sala 2021 ê ye ku rezdar Baris Seyitvan ji bo babeteke rewshenbirî daxwaza xwendina chêrokekê ji min kir. Wisa jî ez bi tesadufî di cihana dijital anga di internetê de li rastî gelek guhertoyên vê destanê hatim. Min dît ku ji aliyê gelek dengbêjan ve hatiye gotin û hîna jî destan di nav gel de zindî ye.

Ya rastî guhertoyên min guhdarî kirin di navbera xwe de gelek cihêrengiyên deher dikirin. Hind xalên ku li hev nakin û yên wek hev jî gelek in. Li aliyê din wekhevî û hevrengiyên bi destanên din re jî mirov dikare tê de bibîne. Weke nimûne destana Dewrêşê Evdî û ya Kerr û Kulik di gelek waran de hev reng in. Lê helbet vê gavê babeta me ne dahûrandina ferq û wekhevîyên di navbera wan destanan de ne. Her wisa ne karê me ye ku em çêrokbûn û destanbûna vê serpehatiyê jî lêkolîn bikin.

Kurt û kurmançî ji bo min ya herî girîng ev e ku weke gelek destan û çêrokên din çî tesîrê li min kiriye?

Ev destana ku weke tabloyeke şerê navxweyî ya di nav Kurdan de hatiye neqîşkirin di encamê de hizrên fîlîzofî yên di derbarê wan pevçûnan û ya li jiyana dinyayê de jî vedibêje. Bi awayekî din mirov dikare bibêje ku gotinên dawî yên Kulikî nihîlîzmeke nebinavkirî tîne bîra mirovî.

Di destanê de navên qehremanan jî balkêş in. Weke mînak Silêman, Werdek, Kerr û Kulik û Perîshanê..Perîshana kecha Emer Axa di hind guhertoyan de weke Shemsî Xan jî cih digire.

Silêman li gorî tewanga zimanê Kurdî veguherîye anga di rastiyê de Silêman e. Werdek jî xwe di nav Kurdan de tê zanîn. Navên Kerr û Kulik yên herî balkêş in û hêjayê lêkolînê ne. Lewre bi taybetî Kerr di meneya kerrbûnê anga nebihîstina guhî de ye an jî maneyeke dîtir tê de heye ew hêjayê pirsê ye. Navê Kulik jî di jiyana xwe de min carekî dît û bihîst. Ew jî li Norşênê navê yekî bû, çî heyf ku ew jî di encama pevçûneke navxweyî de ji aliyê mirovên xwe ve hate kuştin.

Bi van kurte agahiyên ve ezê hewl bidim ku bi qasî di hiş û bîra min de maye wê destanê ji we re bêjim. Helbet destan bi terzê klam û dengbêjî tê gotin, lê ezê ji we re rasterast veguhêzim. Mixabin pirtûka Ahmet Aras bi destê min neket, nexwe minê weke çavkanî ji pirtûkê bixwenda.

Später wurde es als Theaterstück im Radio von Jerewan gespielt und wir haben es mit großer Freude angehört. Das dritte Mal in meinem Leben tauchte dieses Epos im Buch von Ahmet Aras auf. Das Buch ist mir zuerst 1987 in die Hände gefallen und ich hatte noch im selben Jahr die Gelegenheit, den Autor kennenzulernen.

In diesem Jahr, im Jahr 2021, bat mich Barış Seyitvan, eine Geschichte bei einer Veranstaltung zu lesen. Also habe ich mich ein viertes Mal mit dem Epos beschäftigt. In der virtuellen Welt bin ich vielen Versionen dieses Epos begegnet. Früher wurde das Epos von den Dengbêj (Geschichtenerzählern) erzählt und selbst heutzutage wird es noch von Generation zu Generation weitergegeben.

Tatsächlich gab es Unterschiede zwischen den Versionen, die ich hörte. Doch obwohl es Unterschiede gab, waren die Ähnlichkeiten größer. Außerdem gab es einige Übereinstimmungen mit anderen Epen. Das Epos von Dewrêşê Evdî ähnelt in vielerlei Hinsicht dem Epos von Kerr und Kulik. Natürlich diskutieren wir hier nicht die Unterschiede und Gemeinsamkeiten verschiedener Epen. Genauso soll an dieser Stelle nicht untersucht werden, ob es sich um Volksmärchen oder Epen handelt, sondern viel wichtiger ist mir, die Auswirkungen, die die Volksmärchen und Epen auf mich hatten, zu untersuchen.

Dieses Epos, das den Bürgerkrieg zwischen den Kurden wie ein Schaubild darstellt, legt auch einen philosophischen Diskurs über Konflikte und Kriege dar. Andererseits könnte man auch behaupten, dass Kuliks Worte an einen unausgereiften Nihilismus erinnern.

Bemerkenswert sind die Namen im Epos. Silêman, Werdek, Kerr und Kulik und Perîşan... Perîşan, die Tochter von Emer Agha, wird in anderen Versionen Şemsî Xan genannt. Der Name Silêman änderte sich durch die Deklinationsregeln des kurdischen Kurmandschî-Dialekts. So wurde aus Silêman schließlich Silêman. Der Name Werdek ist unter Kurden gebräuchlich. Am Interessantesten sind die Namen von Kerr und Kulik. Sie wären eine Untersuchung wert. Der Name Kerr steht in Verbindung mit dem Hören bzw. mit dem Ohr und bedeutet soviel wie taub. Aber es wäre wichtig zu untersuchen, welche andere Bedeutungen es noch gibt.

Abgesehen von diesem Epos habe ich den Namen Kulik nur einmal in meinem Leben gehört. In Norşin, einem Distrikt der Provinz Bitlis, trug jemand diesen Namen, der leider bei einem der Konflikte zwischen den Kurden ums Leben kam.

Nach dieser kurzen Einführung will ich nun endlich dieses Epos, zumindest soweit ich mich erinnern kann, erzählen. Eigentlich wird dieses Epos im Stil von Kilam und Dengbêj gesungen, aber ich werde es ganz normal erzählen. Wenn ich das Buch von Ahmet Aras finden könnte, würde ich es einfach vorlesen.

Destan bi pevchûna Silêmîn û pismamên wî ve dest pê dike. Ji ber ku birayên wî jî piştta pismaman digirin Silêmîn xeyidî û terka êlê kir.

'Pir çû, hindik çû. Sivik çû giran çû. Çol û çolistan bû, qûm û qumistan bû. dem û demistan bû. ser û sergerdan bû. Di deştan re derbas bû, di zozanan de xwar bû. di çiyayan de wergeriya, goştê pezkuyiyan xwar. Kete çolan avên golgeniyan vexwar. Rastî rêwî û bazirganan hat, rastî rewil û nêçîrvanan hat. Rastî başan hat, dilgeş bû. rastî neçê û xeraban hat dilreş bû.' Da ser rê bi şev û bi rojan çû heta gihişt êla Axayê Gêsî.

Axa bi eslê xwe Erebbû. Heft kurên wî hebûn. Maleke têr û tijî bû. Silêmîn li cem wan hêwirî û ket xizmeta wan. Him karên wan dikir û him jî di şer û belayê de jî piştmeîriya wan dikir. Lewre jî kurên axayî him jê hez dikirin û him jî ji mêraniya wî chavnebarî dikirin. Qîzeke axê ya bi navê Werdekê jî hebû. Werdekê li çar hêlan bi delalî û bi qehremaniya xwe deng vedabû. Bi emir mezin û xama bû, lê dikirin nedikirin mêr nedikir. Ji bo zewacê şertê Werdekê hebû û digot: kî bikare piştta min deyne erdê ezê bê şert bi wî re bizewicim.

Ew qas sal û zeman ew qas xort û qehreman hatibûn, xwe lê ceribandibûn lê yekî ji wan jî nekarîbû piştta Werdekê deyne erdê.

Das Epos beginnt mit dem Konflikt zwischen Silêmîn und den Söhnen seines Onkels. Da seine Brüder die Söhne seines Onkels unterstützten, wurde Silêmîn wütend und verließ den Stamm. Er ritt und ritt, über Berg und Tal, mal schnell, mal langsam. Er durchquerte Wüsten, kam durch alle Jahreszeiten. Er ritt über Ebenen, rastete auf den Almen, verirrt sich in den Bergen und aß das Fleisch wilder Ziegen. Er trank vom modrigen Wasser, das sich in den Wüsten angesammelt hatte. Er begegnete Reisenden und Händlern, Jägern und wilden Tieren. Er war glücklich, wenn er den Guten begegnete und er war des Lebens müde, wenn er den Bösen begegnete. Er reiste Tag und Nacht bis er schließlich in die Gegend kam, in der der Stamm des Agha von Gêsî lebte.

Der Agha war ursprünglich Araber. Er hatte sieben Söhne und eine große Familie. Silêmîn suchte Zuflucht bei ihm und begann für ihn zu arbeiten. Er diente dem Stamm und zog sogar für sie in den Krieg. Deswegen mochten die Söhne des Aghas ihn sehr, zugleich waren sie aber eifersüchtig auf seine Tapferkeit. Der Agha hatte eine Tochter namens Werdek. Werdek war berühmt für ihre Schönheit und ihre Tapferkeit. Sie war zwar schon älter, aber immer noch nicht verheiratet. Sie wollte auch nicht heiraten. Nur unter einer Bedingung war sie zur Heirat bereit: Wenn es jemand schaffen würde, sie im Ringkampf zu besiegen, dann würde sie denjenigen heiraten, dem das gelang. Jahrelang versuchten zahlreiche junge Männer sie zu besiegen, doch niemandem gelang es.



Rojek hat Silêmîn xwe da ber û got ez jî dixwazim şansê xwe biceribînim. Teklîfa wî hat qebûl kirin û Werdek û Silêmîn avêtin hevdu. Di encama ceribanineke pir zehmet de Silêmîn destê xwe avête 'kembera qewetê' û piştî Werdekê danî erdê.

Wisa jî Werdek, bav û bira tev de li ser soza xwe man û Silêmîn bi Werdekê re zewicî. Sal û dem çûn du kurên wan çêbûn. Navê yekî danîn Kerr û yê din jî danîn Kulik. Di wê navî de Silêmîn bi mêranî û jêhatîbûna xwe nav daye. Birayên Werdekê jê gelek aciz in û li riyê wendakirina serê wî digerin. Kerr û Kulik jî mezin dibin û ew jî mîna dê û bavên xwe bi dest û pê, bi cesaret û jêhatî ne. Di encama şerekî di navbera êlên din û ya Gêsiyan de Silêmîn tê kuştin. Kes bawer nake, Werdek jî bawer nake.

Dibêje: "Hebe nebe birayên min fetlek li serê wî gerandin û ew dan wendakirinê." Lê çareyeke din jî nabîne û lê dixebite ku herdu kurên xwe mezin bike. Di nav demê de dibîne ku birayên wê jî kuran jî hez nakin û aciz in.

Eines Tages wollte Silêmîn sein Glück versuchen. Seiner Bitte wurde nachgekommen und Werdek und Silêmîn begannen zu ringen. Nach einem langen und harten Kampf gelang es schließlich Silêmîn Werdek auf den Boden zu drücken und sie somit zu besiegen. Werdek, ihr Vater und ihre Geschwister hielten ihr Wort und so heirateten Silêmîn und Werdek. Die Jahre vergingen und sie bekamen zwei Söhne. Einer von ihnen hieß Kerr und der andere Kulik. Der Ruhm von Silêmîns Tapferkeit dauerte an. Werdeks Brüder störte das sehr und so suchten sie nach einer Möglichkeit, ihn loszuwerden. Auch Kerr und Kulik wuchsen heran und wurden stark, mutig und talentiert wie ihr Vater.

In einem Krieg zwischen dem Stamm der Gêsi und anderen Stämmen kam Silêmîn ums Leben. Werdek konnte es nicht glauben und sagte: „Da ist etwas faul. Meine Brüder müssen ihn in einen Hinterhalt gelockt und ihn verschwinden haben lassen.“ Aber es gab nichts, was sie tun konnte und so widmete sie sich der Erziehung ihrer Kinder. Doch im Laufe der Zeit stellte sie fest, dass ihre Brüder auch Kerr und Kulik nicht mochten und ihre Existenz nicht akzeptierten. Als Werdek klar wurde, dass sie keinen Platz im Stamm hatte, nahm sie ihre beiden Söhne und zog in die Ferne.



Werdek êdî li cem êlê ji xwe û ji zarên xwe re tu xêrê nabîne û bar dike. Werdek li gel kuran diçe û diçe. Pishtî rêwîtiyeke dirêj li warê Mila li ber mala Emer Axa datîne. Li wir bi cih dibe. Destpêkê her tişt baş dimeşe, piştî Kerr û Kulikên ku êdî bûne mîrên xas hêdî hêdî tesîra xwe li derdorê dikin. Ne eşîr, ne axa û ne jî mîrxasan nas dikin. Nexasim Kulik bi babegîtiya xwe navdar bûye. Kesê ku bikare bêje Kulik ez hatime te nîne. Emer axa li gel êl û eşîrê ji vê rewşê nerazî ne, dixwazin bi awayekî ji wan xelas bibin. Lê yên li hember Kerr û Kulik in mesele ne hêsan e. Keçeke Emer axa ya bi navê Perîşanê heye. Bi delaliya xwe nav û deng belav kirine. Wisa delal e ku gava "mewûja reş dixwe di gerdana wê de xuya dike."

Rojekê du derwêş li mala Emer axa dibin mêvan. Wisa jî ew firseta ku Emer axa û êla wî lê digerin ji nişkeve derdikeve pêşiya wan. Herdu derwêş dixwin vedixwin. Piştî yek ji wan dibêje: "Malê tu xweş mal î, lê çibikim tiştê jê kêm e. Heta ew jî lê zêde nebe, bila Emer axa nebêje ez xwedî mal, dîwan û xulam im." Jina Emer axa wan gotinan dibihîse û diçe li nav destê Emer axa datîne. Gotina derwêşan jî ev e: "Heta Bilêcana hespê mîrê Ereban nekeve vê malê, ev mal nabe mal." Gava Emer axa wan gotinan dibihîse, pir lê dikeve. Rûdine civat û cemeeta xwe kom dike û dibêje: "Gelo kî dikare hespê mîrê Gêsa Bilêcanê ji min re bîne? Di nav eşîrên li derdora me de babegîtekî wisa nîne."

Bi şev û rojan li ser difikirin û li kes an jî kesên wêrek digerin. Piştî Emer axa biryar dide ku ji bo anîna Bilêcanê xelateke muhim pêşkêş bike. Wisa jî li derdor belav dike û dibêje: "Kijan babegîtê ku bikare Bilêcanê ji min re bîne, ezê Perîşana keça xwe weke xelat bi wî re bizewicînim." Wisa jî Emer axa gazî kes û êlan dike û dibêje bila li dîwanê kom bibin, ezê meseleyeke muhim bi wan re biaxivim. Perîşanê gava qerara bavê xwe dibihîse pir li ber xwe dikeve û bi lez cewab dişîne ji bavê xwe re. Êvarê gava axa û mêvan li dîwanê rûniştî ne, ji nişkeve xulam diçe ber derî û pêlava axayî datîne. Ew jî tê wê maneyê ku meseleke cidî heye û divê axa derkeve derve. Axa dertê û gotina keça wî jê re dibêjin. Gava diçe cem keça xwe dibîne ku Perîşan pir xemgîn e. Dibêje "Bavo te ez avêtime ber bazar û mazadê û heya min jî hîç jê nîne. ev çawa dibe?" Axa pêşî hêrs dibe û piştî li ber dikeve. Dibêje: "Ew kesê bikare Bilêcanê ji nav Ereban û Erebanê bîne qehremanekî bê emsal e. Ka dikarin nikarin ew jî ne zelal e."

Nach einer langen Reise erreichte Werdek die Länder des Stammes der Milan und klopfte an Emer Aghas Tür. Sie ließ sich mit ihren Söhnen bei ihnen nieder. Zunächst lief alles sehr gut. Kerr und Kulik waren zwei tapfere junge Männer, die großen Einfluss auf ihre Umwelt hatten. Besonders Kulik war berühmt für seine Tapferkeit. Niemand wagte es Kulik herauszufordern. Doch Emer Agha und sein Stamm waren mit dieser Situation nicht zufrieden und überlegten, wie sie Werdek und ihre Söhne wieder loswerden könnten. Aber so einfach war das nicht. Emer Agha hatte eine Tochter namens Perîşan. Sie war berühmt für ihre Schönheit. Jeder, der ihre Schönheit sah, dachte sie wäre der Mond.

Eines Tages besuchten zwei Derwische Emer Agha. Das war die Gelegenheit, auf die Emer Agha und sein Stamm gewartet hatten. Die beiden Derwische aßen und tranken. Dann sagte einer von ihnen zum anderen: „Das Haus ist schön, was soll man sagen, aber irgendetwas fehlt. Solange das so ist, sollte Emer Agha nicht sagen, dass er reich sei und viele mutige Kämpfer und Diener habe.“ Die Frau von Emer Agha hörte dies und erzählt ihrem Mann sofort davon.

Was die Derwische damit sagen wollten, war folgendes: „Solange Bilêcan, das Pferd des arabischen Aghas, nicht in diesem Haus ist, wird dieses Haus kein Haus sein.“ Diese Worte machten Emer Agha zu schaffen. Er versammelte die Alten und Weisen des Stammes und sprach zu ihnen: „Sagt mir, wer kann mir Bilêcan bringen, das Pferd des Aghas von Gêsî?“

Sie überlegten Tag und Nacht, welcher Tapferne das Pferd Bilêcan bringen könnte. Schließlich versprach Emer Agha demjenigen eine große Belohnung, der es schaffte Bilêcan zu ihm zu bringen. In alle Himmelsrichtung ließ er die Nachricht verbreiten: „Welcher Tapferer mir das Pferd Bilêcan bringen kann, der soll meine Tochter Perîşan zur Frau bekommen.“ Emer Agha ließ die Neuigkeiten verbreiten und berief den Diwan ein, bei dem er wichtige Sachen besprechen wollte. Als Perîşan davon hörte, war sie sehr aufgebracht und ließ ihrem Vater sofort eine Nachricht überbringen.

Am Abend, als die Stammesältesten und die Gäste sich zum Diwan versammelten, ging einer der Diener zur Tür und stellte die Schuhe des Aghas vor dessen Füße. Das bedeutete, dass die Angelegenheit äußerst ernst war und der Agha nach draußen gehen musste. Als Emer Agha vor die Tür trat, sah er seine Tochter kommen, die, wie er feststellte, sehr aufgebracht war. Sie sprach: „Vater, warum versuchst du mich auf dem Markt zu verkaufen, ohne mich zu fragen?“. Zuerst wurde Emer Agha wütend, aber es stimmte ihn nachdenklich. Er sagte zu seiner Tochter: „Die Person, die Bilêcan von den Arabern hierher bringen kann, wird der Tapferste der Tapfersten sein. Ich bin mir nicht sicher, wer das schaffen wird. Aber glaube mir, du wirst am Ende sehr zufrieden sein.“

Doch Perîşan entgegnete: „Nein, ich bin damit nicht einverstanden. Du hast alle wichtigen Leute des Stammes versammelt, aber die beiden Söhne von Werdek wissen nichts davon. Wenn Kerr und Kulik nicht an diesem Treffen teilnehmen, wird daraus nichts werden.“

lê tu yê memnûn bî.” Perîşan dibêje “Na, ez qebûl nakim. Te gazî hemû eşîr û kesan kiriye, lê haya herdu kurên Werdekê jê nîne. Eger Kerr û Kulik jî neyên civatê ev kar hîç nabe.”

Emer axayê ku ji mêj ve dixwest ji herdu birayan xelas bibe. Di cîda dibêje: “Belê belê, ezê gazî wan jî bikim. Bê wan em civatê saz nakin. Meraqa meke.” Wisa jî ji xulamên re dibêje: “Eger herdu bira Bilêcanê bînin ji xwe ez digihijime xaya xwe na eger nekarin û li wir bêne kuştin ji xwe ez ji wan xelas dibim.” Wisa jî xulamê axê diçe pey herdu biran ji bo civatê. Kerro gava dibihîse toqatek li bin guhê xulê dixê û dibêje: “Biqeşte here. Çi karê me li civatê û cematê heye! Xulam ji derba Kerro sewsî dibe, gêj dibe û direve. Li rê rastî xulamêkî Kerr û Kulik tê. Meseleyê jê re dibêje û xulam jî dibêje: “Heyran Kerro ne tiştê e, tu xwe bigihîne Kulik. Ew serek û sermiyanê mala Werdekê ye.”

Emer Agha wollte Kerr und Kulik schon lange loswerden. Darum sagte er sofort: „Ja, ja, ich werde sie zum Treffen einladen. Wir werden das Treffen nicht ohne sie beginnen. Keine Sorge.“


Zu einem seiner Diener sagte Emer Agha: „Wenn sie es schaffen mir Bilêcan zu bringen, werde ich mein Ziel erreichen, aber wenn sie es nicht schaffen, dann werde ich die beiden Brüder für immer los sein.“ Daraufhin machte sich einer der Diener auf den Weg, um die beiden Brüder zum Treffen zu rufen. Doch als Kerr die Neuigkeiten hörte, war er so erbost, dass er dem Diener eine Ohrfeige verpasste und sagte: „Mach bloß, dass du fort kommst! Was haben wir schon auf einem Diwan zu suchen?“

Obwohl der Diener vom Schlag ganz benommen war, rannte er um sein Leben. Auf dem Rückweg begegnet er einem der Diener von Kerr und Kulik und erzählte ihm, was passiert war: „Ach, vergiss Kerr. Du musst zu Kulik gehen. Er ist der Besitzer und Beschützer von Werdeks Haus,“ sagte der Diener.



Bi riyeke ew derbasî oda Kulik dike û derdê xwe jê re dibêje. Kulik dibê arî û sekin pê nakeve. Kerro hey dibêje: "Na bira em neçin" Lê Kulik razî nabe û dibêje: "Di nav van eşîran de em çawa xwe bidin paş?" Wisa jî li oda axa dibin mêvan.

"He wi wi.. He wi wi... Emer axa mesrefeke giran datîne, fîncana qehwê li navendê datîne, dibêje kî rake fîncanê wê here Bilêcanê ji nav Ereban ji min re bîne û keça min Perîşanê bistîne." Gava fîncan tê gerandin kes serê xwe ranake û lê nanêre. Kulik radihiyê û bi serê xwe de dike. Wisa jî xwe li rê didin. Werdek gava dinêre bira bi hespên xwe çargavî bi rê ketin. Tevat nake û kî tê pêşiya wê ji wan pirs dike.



Di dawiyê de fahm dike ku mesele çî ye? Ew jî li hespê xwe siwar dibê û dide pey wan. Piştî saetan nêzikî li wan dike, Kulik vedigere dibêje Kerro lawo eger ev ne Werdekê be bavê min jî be ezê serê wî jêkim. Kî çawa dikare wiha bide pey me, toz û xubarê li ser me de rake? Û dewam dike: "Lê ev ajotin a Werdekê ye. Nexwe kes nikare wisa hespê bibeîne."

So gelangte der Diener des Agha zu Kulik und erzählte ihm von den Geschehnissen. Kulik war ganz aufgebracht, als er davon hörte. Auch wenn Kerr sagte, dass sie nicht zum Diwan gehen sollten, hörte Kulik nicht auf ihn und sagte: „Wir können doch nicht hinter den Stammesangehörigen zurückstehen.“ Und so machten sie sich auf den Weg.

Beim Diwan erzählte Emer Agha von der Belohnung. Dann stellte er eine Kaffeetasse in die Mitte des Raumes und sagte: „Wer diese Tasse nimmt und Bilêcan von den Arabern holt und mir bringt, der wird Perîşan bekommen.“

Als die Tasse die Runde machte, hob niemand auch nur den Kopf, um nach der Tasse zu schauen. Schließlich griff Kulik nach der Tasse und trank den Kaffee in einem Zug aus. Die beiden Brüder nahmen ihre Pferde und machten sich im Galopp auf den Weg. Als Werdek das sah, konnte sie sich nicht halten, warf sich vor sie und fragte nach dem Grund für ihren Weggang. Ihr wurde sofort klar, worum es ging.

Also nahm sie ihr Pferd und folgte den beiden. Einige Stunden später hatte sie sie fast eingeholt. Kulik drehte sich um und sagte zu Kerr: „Ist das nicht Werdek dort hinten? Wer erdreistet sich, wie eine Verrückte zu reiten und uns zu folgen? Selbst wenn es mein Vater wäre, würde ich ihr den Kopf abschlagen.“ Dann erkannte er: „Das ist wirklich Werdek, die da reitet. Niemand sonst kann ein Pferd so schnell reiten.“

Werdek digihije wan û bi wan ve lava dike. Dibêje: „Emer axa fêl û kemîn daniye, we dişîne rêya nehatinê. Ew yên hûn diçin ser wan xalên we ne, kes heta niha ji nav lepên wan xelas nebûye. Şerê xal û xwarziyan ne heq û ne baş e, veşerîn.”

Kulik ji ya xwe nayê xwar. Dibêje: „Dayê, ji xwe bavê min jî di destê wan de hat wendakirin û ji mêj ve ye bala min û Perîşanê jî li ser hev e. Ji bo min pêkanîna vî karî rûmeteke pir bilind e.” Werdek dike nake pê nikare. Bêçare dimîne û çend şîretan li wan dike. Dibêje: „Lawo eger hûn çûn jî bila haya we ji we hebe. Ew ax û erd dijwar e. Nekevîne xewa giran. Hespê te Sozik hînê wan deran nebûye. Eger ji ava golgeniyan vexwe hûn nema dikarin pê bibezin û bilebitin. Xelasyiza we jî ne mumkin e.”

Û dewam dike:

‘Ji bîr mekin ew xalê we ne. Eger hûn hevdu biqelînin wê xelk bêje xal û xwarziyan hevdu qir kirin Werdek ma bê xwedî, mêr û bê kes.’ Wisa jî diçin. Di riya dûr û dirêj de bi rojên diajon û digihijin ber ava Xaburê. Pir westiyane ji hal ketine. Dikin nakin bi xwe nikarin û di xew re diçin. Piştî çend saet û rojan hişyar bûne, pê nizanin. Gava radibin ku çî bibînin. Sozik li hawîrdor çêraye, ji avên li derdor jî vewxariye û zik lê bûye hemban. Gotina Werdekê tê bîra wan lê êdî dereng e.

Piştî rêwîtiyeke dirêj û bi zehmetî digihijin ber konê Gêsa. Dibe êvar davêjin ser wan û Bilêcanê ji nav konan dertînin. Piştî demekê xalên wan bi xwe dihesin û didin pey wan. Xal di nav xwe de dibêjin: ‘Hebe nebe ew kurên Silêmîn in, ne ew toxim be kes vê cesaretê nake, ji nav konên me Bilêcanê dernaxe û nabe.’ Didin pey herdu biran. Kerr û Kulik nema ji ber wan xelas dibin û dikevin şer. Di nav germahiya şer de Kerr ji wan wenda dibe. Hevdu wiha dibin wiha tînin. Kulik bi tena serê xwe toz û dûmanê li ser wan radike. Heta Kerro digihije ba wan Kulik şeş xalên xwe dikuje. Dor tê ser ê heftan gotinên Werdekê tîna bîra wî. Dibêje: ‘Bila ev jî bimîne. Bila kes nebêje Werdekê bê bav û bê bîra maye.’ Di wî navî de mîrên êlê jî digihijin wan û didin ser Kulik. Dikin nakin pê nikarin. Piştî dibînin ku rewşa Sozik ne baş e. Berê Sozik didin nav qûmistanê. Her der çal û kort e û Sozikê ava genî vexwariye nikare lingên xwe ji kortan derîne. Sozik dikeve çalê. Gêsi digihijin Kulik û 17 derbên riman li nav piştî wî didin. Kerro gava digihije, çî bibîne Kulik birîndar û di bin Sozikê de maye. Bi kotekî Sozik ji ser dide alî û dibêje: ‘Bîra ezê birîna te derman bikim, meraqa meke tu yê xelas bibî.’

Als Werdek sie eingeholt hatte, flehte sie ihre Söhne an: „Emer Agha hat euch eine Falle gestellt. Das sind eure Onkel, von denen ihr das Pferd holen wollt. Es gab bisher noch niemand, der lebend von dort zurückgekehrt ist. Ein Krieg zwischen Onkel und Neffe ist weder richtig noch gerecht. Kehrt um!“ Aber Kulik machte seine Entscheidung nicht rückgängig. „Mutter, mein Vater ist sowieso durch ihre Hand gestorben. Außerdem habe ich schon lange eine Aue auf Perîşan geworfen und sie auf mich. Für mich ist das eine Ehrensache.“

Als Werdek merkte, dass sie Kulik nicht von seiner Entscheidung abbringen konnte, riet sie ihm verzweifelt: „Meine Söhne, passt gut auf euch auf, wenn ihr unbedingt gehen wollt. Die Gegend dort ist sehr rau. Habt immer ein waches Auge, auch in der Nacht. Sozik, dein Pferd, kennt so etwas nicht. Wenn die Pferde vom modrigen Wasser trinken, können sie nicht mehr schnell laufen und euch auch nicht mehr retten.“ Sie fügte noch hinzu: „Denkt daran, dass es eure Onkel sind. Wenn ihr euch gegenseitig umbringt, wird die ganze Welt darüber sprechen. Und ich werde niemanden mehr haben.“

Sie setzte ihren Weg fort. Sie ritten Tage und Nächte, bis sie schließlich den Fluss Xabur erreichten. Sie waren so müde, dass sie sich nicht mehr wach bleiben konnten und schliefen ein. Stunden später erwachten sie und sahen, dass Sozik im umliegenden Gras weidete und dass sein Magen ganz aufgebläht war. Da kamen ihnen die Worte Werdeks in den Sinn, aber es war schon zu spät.

Nach einer beschwerlichen Reise kamen die beiden beim Stamm der Gêsi an. Bei Einbruch der Nacht überfielen sie den Stamm und holten Bilêcan aus dem Zelt. Nach einer Weile wachten ihre Onkel und ihre Cousins auf und gingen den Brüdern nach. Untereinander hörte man sie reden: „Das müssen die Kinder von Silêmîn sein. Sonst würde so etwas niemand wagen.“ Sie folgten den beiden Brüdern und Kerr und Kulik schafften es nicht sie abzuhängen und mussten sich dem Kampf stellen.

Als der Kampf seinen Höhepunkt erreichte, verschwand Kerr plötzlich. Doch der Kampf dauerte an und Kulik sorgte für ein mächtiges Chaos. Als Kerr wieder auftauchte, hatte Kulik bereits sechs seiner Onkel getötet. Als der siebte Onkel an der Reihe war, erinnerte er sich jedoch an die Worte Werdeks und sagte zu sich: „Ihn will ich leben lassen, sodass niemand sagen kann, dass Werdek weder Bruder noch Vater hat.“

Inzwischen nährten sich auch andere Männer des Stammes Kulik und griffen ihn an, aber sie hatten keine Chance. Doch dann sahen sie, dass der Zustand von Kuliks Pferd, Sozik, nicht gut war und versuchten es in den Sand zu drängen. Dort waren überall Gruben und Sozik hatte ja von dem modrigen Wasser getrunken und war nun nicht mehr in der Lage auszuweichen. Schließlich stürzte Sozik in eine der Gruben, die Gêsis umzingelten Kulik und rammten ihm 17 Speere in den Rücken.

Kulik dibêje: 'Na bira. Ev birîn sax nabin. Ez baş bi derba mirinê dizanim. Tu xwe reht meke. Bi tenê daxwaza min ji te ev e. Ji Werdekê re bêje Kulik birakî ji te re hişt û vaye tu jî heyî. Ew ne bêkes e.' Û Kulik wiha li gotina xwe dewam dike: 'Wesiyeta min li te, tu Perîşanê bike bûka mala Werdekê. Bila ew miraz jî wisa pêk were û Perîşan nebe para xelkê. Ji birayê xwe re bêjim. Gava te ez birim û danîm ser çardarê, milên min rast û çep pê ve berde. Bila paş û pêş bihejin û li ba bibin. Kî pirs kir û got gelo çima: 'Bêje dinya wiha hatiye û wiha diçe.' Û gotinên xwe wiha diqedîne: 'Bira bizane ku min dinya kir zikê hêkekê û li singê zinarî xist.' Kerro Kulik davêje ser piştê Bilêcanê û vedigere. Gava digihije malê gotinên wî tevde pêktîne. Bilêcanê dide Emer axa û ew li dewsa Kulik bi Perîşanê re dizewice.

Kerr sah, dass Kulik verletzt war und unter Sozik lag. Mit aller Kraft drehte er Sozik zur Seite und sagte: „Mein Bruder, mach dir keine Sorgen. Ich werde deine Wunden verbinden und du wirst überleben.“ „Nein, mein Bruder, diese Wunden werden nicht heilen. Ich weiß, wie sich ein Todesstoß anfühlt. Ich will nur, dass du mir eins versprichst. Sag Werdek, dass Kulik ihr einen Bruder gelassen hat. Sie wird nicht alleine sein.“ Und er fügte hinzu: „Dies ist mein Testament: Nimm Perîşan zur Frau. Wir wollen unser Wort halten und Perîşan soll niemanden anderem in die Hände fallen. Wenn ich tot bin, legt mich in einen Sarg und lasst meine Arme auf beiden Seiten heraushängen. Sie sollen ruhig baumeln. Und wenn jemand fragt warum, dann sagt: So ist er auf die Welt gekommen und so geht er auch. Das ist mein Testament.“

Und er vervollständigte seine Worte: „Mein Bruder, du musst wissen, dass ich die Erde in ein Ei gesteckt und gegen einen Felsen geschlagen habe.“ Dann lud Kerr Kulik auf Bilêcan's Rücken und kehrte zurück zum Stamm des Emer Agha. Als er nach Hause kam, tat er alles, was Kulik ihm gesagt hatte. Er schenkte Emer Agha Bilêcan und an der Stelle Kuliks heiratete er Perîşan.



BILDIROX *BILDIROX*

Vebêjer: Ali Koçak

Erzähler: Ali Koçak

Ci hebûye çî tunebûye. Sê tenê xweng û yek bira hebûye. Navê lawik Bildirox bûye. Bildirox yanê ûvey bûye. Yanê birayê wan ê oz (rast) nîn e.

Rokî dibên:

- Em herin êzingan.

Bijêrikan dîkin pêşa xwe terin êzingan. Diçin êzingan bira bijêrikên xwe naxwe dike cêba xwe di sekine.

Es waren einmal drei Schwestern und ein Bruder. Der Name des Jungen war Bildirox. Er war der Stiefbruder der Schwestern, nicht ihr richtiger Bruder. Eines Tages sagten sie: „Lasst uns Brennholz sammeln gehen.“ Also nahmen sie gerösteten Weizen und steckten ihn in ihre Taschen.



Terin êzingan, dibêje:

- Ê min bijêrikên min di cêba min da ne, êzingên min top bikin ez bijêrikan didim we.

Dibên:

- Temam.

Xweng bijêrikên wî dixwin. Êzingên wî jî top dikin li piştta wî lê dane, dibên:

- De Bildirox me li piştîya te lê nîye de bigire em herin.


Piştîya xwe digirin dikevin rê, lê Bildirox giran tê, Bildirox çima giran tê?

Bildirox li mala pîra mêrxur lelebî dîtine. Ew ê herê mala pîra mêrxur lelebîyan bixwe. Tên, dibê:

- Êvar dibî ez diçim mala pîra mêrxur.

Bildirox wartete bis seine Schwestern fertig waren und sagte zu ihnen, als sie losgingen: „Wenn ihr für mich Brennholz sammelt, dann bekommt ihr meinen Weizen.“ Die Schwestern waren einverstanden und sie machten sich alle zusammen auf den Weg.

Die Schwestern aßen die Weizenkörner, die Bildirox ihnen gegeben hatte. Als sie genug Brennholz gesammelt hatten, luden sie sich das Holz auf den Rücken und sprachen zu ihrem Bruder: „Los Bildirox, wir haben auch dir beim Aufladen des Holzes geholfen, trag es nun wenigsten nach Hause und lass uns losgehen!“ Also machten sie sich auf den Weg zurück. Jedoch beschwerte sich Bildirox bald, dass seine Last zu schwer sei, weswegen die Schwestern fragten: „Bildirox, warum ist deine Last zu schwer?“ Sie machten schließlich eine Pause in der Nähe des Hauses der menschenfressenden Großmutter. Bildirox wollte unbedingt in ihr Haus gehen und Lelebî, geröstete Kichererbsen, essen und sagte zu seinen Schwestern: „Wenn es Abend wird, werde ich zum Haus der menschenfressenden Großmutter gehen.“



Xweng dibên:

– Bira em herin mala pîra mêrxur, pîra mêrxur wê me bixwe. Pêşîyê êvare, em herin mala xwe.

– Na, ez terim mala pîra mêrxur.

Tên mala pîra mêrxur. Piştîya xwe datînin rûdinin, pîra mêrxur we re nîn-mîn (nan-man) datîne, dixwin.

Êvar dibî, dibe ke dereng ket, nerin sibe herin. Cilan datîne dikevin cilan. Pîra mêrxur disekine, dibê:

– Dike biko kî pay ye, kî raket!

Bildirox dibê:

– Pîra min ez pay me.

Pîre dibe:

– Tu çima raneketiye Bildiroxê min.

Dibê:

Duh yan tawan pîrika min ji me re mirîşk şerje kiribû me xwar loma xewa min nehat.

Pîra mêrxur radibe mirîşkê şerje dike, sifre hazir dike nîn (nan) dixwin radikevin, xeylî xwe disekinî yîne [dîsan] pîra merxur bang dike, dibê:

– Dike biko kî payê, kî raketîye?

Bildirox dibê:

– Pîrka mi ez li pay me.

– Çima Bildiroxê min tu ranekeve?

– Şeva din wan tawan pîrka min ji me ra kilora sîr kiribûye, me kilora sîr dixwar.

Pîra mêrxur radibe kilora sîr dike, dipeje datîne dixwin û radikevin. Xeylî ara ke terî, dîsan dibê:

– Dike biko ki payê, kî raketîye!

– Pîrika min ez pay me.

– Bildiroxê mi çima tu ranekewe?

– Şeva din wan tawan pîrika min ji me ra mange şerje kir kiribû qawirme, me ew xwar loma xewa mi nehat.

Pîra mêrxur radibe mange şerjê dike dike qawirme dixwin sibe ronî dide... Sibe ronî dide xweng radibin piştîyê xwe digirin, Bildirox ew ê leblebîyan bixwe, wî di sindoqê da leblebî dîtine, yek çarixê xwe li wê derê di cî de dihele, hetanî xeylî diçin, dibê:

„Bruder, wenn wir zum Haus der menschenfressenden Großmutter gehen, wird sie uns aufessen. Lass uns nach Hause gehen, bevor es dunkel wird,“ antworteten die Schwestern.

„Nein, ich werde zum Haus der menschenfressenden Großmutter gehen,“ beharrte Bildirox.

Also gingen sie zum Haus der Großmutter, stellten das Holz ab und traten ein. Die menschenfressende Großmutter machte ihnen sogleich etwas zu essen. Als sie aufgegessen hatten, sagte die Großmutter, dass es schon dunkel sei und sie nicht mehr nach Hause gehen sollten und bereitete ihnen einen Schlafplatz vor. Also legten sich die Kinder in die Betten und schliefen.

Nach einer Weile fragte die menschenfressende Großmutter: „Wer schläft und wer ist wach?“

„Ich bin wach, Großmütterchen“, antwortete Bildirox. „Warum schläfst du denn nicht, mein lieber Bildirox?“, fragte die Großmutter.

Und er antwortete: „Gestern um die gleiche Zeit hat mir meine Großmutter ein Hühnchen geschlachtet und gekocht und dann haben wir es gegessen. Deswegen kann ich nicht schlafen.“

Also ging die menschenfressende Großmutter los, schlachtete ein Huhn, kochte es und gab es Bildirox zu essen. Danach legten sie sich wieder schlafen.

Nach einer Weile fragte die menschenfressende Großmutter wieder: „Wer schläft und wer ist wach?“ „Ich bin wach, Großmütterchen“, antwortete Bildirox. „Warum schläfst du denn nicht, mein lieber Bildirox?“, fragte die Großmutter.

Und er antwortete: „Gestern um die gleiche Zeit hat mir meine Großmutter Sesamringe mit Knoblauch gebacken und dann haben wir sie gemeinsam gegessen. Deswegen kann ich nicht schlafen.“

Also buk die menschenfressende Großmutter Sesamringe mit Knoblauch und aß sie mit Bildirox zusammen. Nachdem sie sich wieder hingelegt hatten, fragte sie erneut: „Wer schläft und wer ist wach?“

„Ich bin wach, Großmütterchen“, antwortete Bildirox.

„Warum schläfst du denn nicht, mein lieber Bildirox?“, fragte die Großmutter.

Und er antwortete: „Gestern um die gleiche Zeit hat mir meine Großmutter eine Kuh geschlachtet, einen Braten gemacht und mit mir gegessen. Deswegen kann ich nicht schlafen.“

Also schlachtete die menschenfressende Großmutter eine Kuh und bereitete einen Braten vor, als bald der nächste Tag anbrach. Die drei Schwestern standen auf und luden sich das Holz auf den Rücken.

- Ez vedigerim çarixa xwe digirim.

Xweng ra berê digerin, serê digerin dibên:

- Law Bildox mere, pîra mêrxur te dixwe, me xwe bi zorî xelas kirine.

- Na, ez terim çarixa xwe digirim.

Vedigerî, terê çarixa xwe dire, dikeve sindoqê, leblebîyan dixwe "tiq tiq tiq", pîra mêrxur tê dibîne û derê sindoqê vedike, dibê:

- Te ewqas manga min xwar, mirîşka min xwar, kilora min xwar nika jî tê leblebîyên min dixwe neee!!!

Wî dike nav torbêkî û dev girê dide, dibê:

- Ez herim didanên xwe tûj bikim werim te bixwim!

Diçe didanê xwe tûj dike, Bildirox vedilîzî vedilîzî, zaten mange xwar, golik li vê derê tenê. Golikî dike nav tûrê dev girê dide derdikeve ser qulbe seyr dike. Pîra merxur tê dev te ra tîne, golik diqore, vedike ke Bildirox nîne golik e. Uzulmiş dibe, dibê:

- Wêêê mi mange şerjê kir, golika xwe jî bi xwe xwar, kêrê li ser dilê xwe da dike xwar xwe dikuje.

Mala pîra mêrxur Bildirox re dimîne.

Nur Bildirox hatte sich sie gerösteten Kichererbsen in den Kopf gesetzt, die er in der Truhe gesehen hatte. Also vergaß er mit Absicht einer seiner Latschen, bevor er sich mit seinen Schwestern auf den Weg machte. Nach einer Weile sagte er zu ihnen: „Ich hab meinen Latschen vergessen. Ich werde schnell zurück gehen und ihn holen.“

„Bruderherz, geh nicht zurück. Die menschenfressende Großmutter wird dich aufessen. Wir sind ihr nur knapp entkommen“, flehten die Schwestern ihn an. Doch Bildirox war nicht umzustimmen und kehrte um um seinen Schuh zu holen.

So ging Bildirox zurück und holte seinen Schuh. Dann öffnete er die Truhe mit den Kichererbsen und versteckte sich darin. Knuspernd aß er eine Kirchererbse nach der anderen, als die menschenfressende Großmutter ihn bemerkte und die Truhe öffnete.



„Meine Kuh hast du gegessen, mein Huhn und meine Sesamringe. Und jetzt isst du auch noch meine Kichererbsen!“, sagte sie zu Bildirox, steckte ihn in einen Sack und band diesen fest zu. „Dann werde ich mal meine Zähne schärfen, damit ich dich besser essen kann“, fügte sie noch hinzu und ging weg.

Bildirox wand sich nach links und rechts, solange bis sich der Sack öffnete. Dann legte er die Knochen der Kuh, die die Großmutter in der Nacht geschlachtet hatte, in den Sack und band ihn zu. Das kleine Kalb, das nun ganz alleine war, versteckte er und er selbst stieg aufs Dach, um zu sehen, was nun geschah. Als die menschenfressende Großmutter kam, öffnete sie den Sack und was sie sah, war nicht Bildirox, sondern nur Knochen. Sie wurde sehr traurig, denn natürlich wusste sie nicht, dass Bildirox die Knochen in den Sack gelegt und das Kalb versteckt hatte. „Ahhh, ich habe meine Kuh geschlachtet und mein Kalb gegessen,“ schrie sie, nahm ihr Messer und rammte es sich in die Brust.

So wurde das Haus der menschenfressenden Großmutter zu Bildiroxs Haus.




RITÔEL
RITUALE




ÇIROK
GESCHICHTEN

LÎSTIK
SPIELE



DU. *durchstarten*
Förderprogramm für neue Expert*innen
der Kulturellen Bildung in Berlin



 Bundesministerium
Kunst, Kultur,
öffentlicher Dienst und Sport

**hinterland
galerie**